

## Trawmaya civakî û rêyên başbûnê

Trawmaya civakî ne rûdaneke ku di rabirdûyê de qewimiye û qediyaye; ew, pêvajoyeke zindî ye ku bandorên wê bi rêyên biyolojîk, derûnî û civakî bi nifşan didomin. Ji bo başbûnê şert e ku bêdengî bişikê, rastî derkevin holê û şîneke ... ***Siyabend Aslan/R.8***



## Ji Qefqasyayê heta Kapîtolê

Ji bilî xwepêşandanên bêdawî yên li Gurcistanê, partiya Xewna Gurcistanê ya desthilatdar bi berdewamî çîrokeke siyasî û aborî li dora ramana veguherandina welêt bo navenda lojîstîk a sereke ya başûrê Qefqasyayê ava dike... ***Kurdistan Lezgiyeva/R.7***



## Ji **Azadiya Welat** heta **Ajansa Welat**

Ji rojnameya Azadiya Welat heta Ajansa Welat nêzî 33 salan derbas bûye. Bi têkoşîna azadiya gelê kurd re çapemeniya kurd jî pêşde çûye, bedelên giran dane û kemiliye. Bi rastî bûye reng û dengê gelê kurd. Dengê jibîrketiyan derxistiye... ***Yaşar Eroglû/R.11***


*8 - 14 Kanûn 2025*
*Hejmar:* 312
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com


# xwebûn

xwenasîn e

# Sînema çeka herî bi hêz e

Festîvala Fîlman a Amedê ya 3yemîn piştî 8 salan cara 3yemîn di navbera 7 û 14ê kanunê de tê lidarxistin. Festîval bi dirûşma 'Dinya bi çîrokan tê ba hev' tê li darxistin. Di festîvalê de dê bi giştî 84 fîlm bên nîşandan. Dîrektora festîvalê Lîsa Çalan, bal kişand ser rewşa sînemaya kurdî ya li Tirkiyeyê û got: Li Tirkiyeyê jî ev rewş wisa ye. Ji sînemaya ***'Yeşîl Çam'***ê vir de di serî de kurd û gelek beşên civakê hedef hatine girtin. Jiyana kurdan, rewşa jinên kurd, şexsiyet û hestên wan di vê sînemayê de bi awayekî neyînî hatine nîşandan. Ev sed sal in bi rêya sînemayê li ser kurdan faşîzmeke mezin hatiye meşandin. Kurd îro bi heman şêweyê yanî bi rêya sînemayê dixwazin van polîtîkayan pûç bikin. Ji bo wê ciwanên kurd fîlmên berxwedêr çêdikin. Çeka me ya herî bihêz îro fîlm û sînema ne. Em bi vê rêyê çîrokên gelê xwe tînin ser perdeya spî û nîşanî raya giştî didin. Di wê baweriyê de me ku piraniya sînamegerên kurd jî di vê hişmendiyê de ne. Dixwazin rewşa kurdan û çîrokên xwe belge bikin. Derdê me ev e. Ji ber ku cîhan çavên xwe li me girtiye. Di vê kêliyê de derketina van festîvalan jî parçeyek vê berxwedanê ye. Em dikarin fîlmên hatine kişandin, bi vî awayî nîşanî gelê xwe bidin. Ji bo wê jî gelek... ***Hevpeyvîna Alî Guler/R.4***




## Guhertina 'habitus'ê

Heyeta Îmraliyê beriya civîna komîsyona meclisê, 2yê kanûna 2025an, bi Rêber Apo re hevdîtinek pêk anî. Heyetê der barê hevdîtinê de daxuyaniyek da. Hat gotin ku Rêber Abdullah Ocalan der barê gotin û tevgerên dij-pêvajoyê de nerînên xwe bi heyetê re par ve kirine. Di nirxandinan xwe de nêrîn û nêzîkatiyên li dijî pêvajoya çareseriyê û hewldanên berê yên bi heman rengî berê bi bîr xistin. Li ser vê rewşa ku di hemû pêvajoyan de rû dide, wekî têgiha 'habitus'ê pênase kir û bal kişand ser... ***Felemez Ûlûg/R.6***




## Li Kurdistanê dagirker kî ye?

Rojeva siyasî ya li Rojhilata Navîn germ e. Jixwe tişta tê dîtin jî ew e dê stratejiyên sedsala pêşiya me li gorî vê rojeva germ bên diyarkirin. Lewra her hêz û rêxistinên li vê herêmê ji bo destên xwe xurt bikin bi hemleyên nû xwe tev li vê rojeva germ dikin. Di serî de hêzên wekî Amerîka û Îsraîlê herwiha dewletên wekî Tirkiye, rejîma nû ya Sûriyeyê û welatên bendavê bi hemleyên xwe dixwazin bibin xwedî rol. Bêguman kurd û rêxistinên kurdan jî di nav hewldanên mezin de ne ku bêstatûbûna kurdan ji holê rabe û weke sedsala borî careke din kurd bêstatû nemînin. Dewletên wekî Tirkiye û Sûriye hemleyên xwe li dijî kurdan dikin. Her gava rayedarên van dewletan diavêjin ji bo bêhêzkirina kurd û rêxistinên kurdan e. Ev dewlet di bêstatûbûna kurdan de israr dikin. Lewra gelek tawîzan didin hêzên navneteweyî. Ji ber vê yekê ye ku bi taybetî wezîrê karê derve yê Tirkiyeyê wekî mozan li her derê qaşo dîplomasiyê dike, li dijî kurdan lobiyan ava dike û bi rêya vê dîplomasiyê gefan li rêxistinên kurdan dixwe. Taybetî jî Tevgera Azadiya Kurdistanê, li Kurdistanê wekî "dagirker" bi nav dike û vê yekê piştî her civîna xwe bi lêv dike. Vêca pirsa girîng ev e ku "li Kurdistanê dagirker kî ye?.. ***Hisen Çatikkaş/R.6***

## Hatina Mesûd Barzanî ya Cizîrê

Hatina Mesûd Barzanî ya Cizîrê ket rojevê û gelek guftûgoyên erênî û neyînî li ser hatin kirin. Ji aliyê kurdan ve, hatin û gera wî ya Bakur, bi piranî erênî hat pêşwazîkirin. Lê ji aliyê hinek partî û kesên nijadperest ên tirk ve neyînî hat dîtin û hinek helwestên neyartî û nemirovî ji aliyên hinek erkdarên dewleta tirk ve hatin nîşandin û heta hinek gef jî hatin xwarin. Van aliyên dijber, ger û hatina wî şibandin Koma Aştiyê ya 34 kesan ku sala 2009an ji deriyê Xabûrê derbasî Bakur bûbû, gotinên tund ên dijminane... ***Ahmet Aktaş/R.8***

## 'Êdî dem hatiye ku Tirkiye zagonên xwe biguherîne'

DMMEyê 11 sal berê der barê rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de biryar da ku Tirkiye ji bo mafê hêviyê zagonan biguherîne. Lê 11 sal borîn hê jî Tirkiye di aliyê hiqûqî û zagonî de tu gav neavêtine. Hevserokê Şaxa OHDê yê Amedê Muhîttîn Mûgûç, anî ziman ku divê êdî Tirkiye zagonên xwe biguherîne û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di aliyê fîzîkî de azad bibe. Hevserokê OHDê yê Amedê Muhîttîn Mûgûç, da zanîn ku DMMEyê ji Tirkiye xwestiye ku zagonên xwe biguherîne û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan azad bikî û got: "Lê Tirkiye li gorî biryara DMMEyê ya mafê hêviyê tevnagerin û wî azad nakin. Polîtîkayên tecrîdê didomînin. Rêberê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan di vê pêvajoyê de bi rola xwe rabû. Êdî dem hatiye ku dewlet zagona bingehîn derxîne û Birêz Ocalan azad bike..." ***R.3***



## Çerçoveya dîrokî ya şer

Hilberîna jinan a di nav jiyanê de di xwezaya xwe de ji bo berdewamiya jiyanê û hafizaya civakê xwedî rola sereke bû. Ji ber vê yekê hişmediya mêrperest di destpêkê de êrişê vê hafizayê kir. Hêza jinan a ku hat şikandin ne tenê bû sedema newekheviya zayendan; vê şikandinê di heman demê de ji bo avabûna desthilatdarî û şeran bû bingeh jî. Lêkolînên arkeolojîk û antropolojîk ên ku li ser vê mijarê tên kirin jî nîşan didin ku di xwezaya civakê de şer tune ye. Ev lêkolîn nîşan didin ku şer bi hêz, desthilatdarî û milkiyetkirinê re eleqedar in. Li ser avakirina vê hişmendiyê û pêşxistina tundiyê civak ji nû ve teşe girtiye.Hişmendiya mêrperast a li dijî civaka dayiksalar bi xwe re hêz afirand. Hêz veguherî desthilatdariyê. Desthilatdariyê bi xwe re milkkirinê anî. Milkkirin jî rê li ber şeran vekir. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku afirînerê şeran hişmendiya mêrperest e. Bi milkirina ax, ajal, hilberîn û heta mirovan re newekheviyên... ***Medya Bal/R.2***

## Ji Gilgamêş heta îro lêgerîna nemiriyê

Mirovahî ji destpêka xwe ve vê pirsê dipirse: Ez kî me û çima ez dimirim? Ev pirs ne tenê pirsek hebûnê ye; ew di heman demê de lêgerînek gerdûnî ya mirovî ye ku di dilê çand, ol, felsefe û hunerê de ye. Destana Gilgamêş şahida nivîskî ya herî kevn a vê lêgerînê ye. Rêwîtiya ku Gilgamêş, padîşahê Urukê, ji bo dîtina nemiriyê dest pê kir, di rastiyê de, sembola têkoşîna mirovahiyê ye ku hebûna xwe watedar bike. Gilgamêş temsîla hêz, qewet û şahrezayiyê dike; lê gava ew bi mirina hevalê xwe Enkîdu re rû bi rû... ***Arslan Ozdemîr /R.5***

## Celado seserre

Celadî Dêrsim de zî wezîfeyê xo yo 'bimbarek' ard ca. Seba celadî çinkerdişê şarê kurdî wezîfeyo tewr bimbarek o. Estîya ey pabesteyê çinkerdişê kurdan a. Nê konteksî de bi des hezaran kirmancî serranê 1937-38an de ameyî qirkerdene. Celadî nê qirkerdişî de her tewr metodo barbar gurêna. Ewro merdim vîneno ke îqtîdar sûcê qirkerdişî têna erzeno muxalefetî ser. Wa bêro zanayene ke heta 15ê teşrîna peyêna 1937î Ismet Inonuyî serekwezîrîye kerde û bi zanayîşê Mustafa Kemalî qirkerdiş îdare kerd. La 15ê teşrîna... ***R.9***

# Çerçoveya dîrokî ya şer


Medya Bal

Li tevahiya dîroka mirovahiyê, şer ne ji ber pevçûnên di navbera dewlet an hikûmetan de teşe girtiye, şer di esasê xwe de ji ber avahiyên civakî, rolên zayendî û têkiliyên zayendperest ango mêrperest teşe girtiye.

Her çiqas hevgirtin, hilberîna hevpar û parvekirin di civakên mirovahiyê yên destpêkê de bingehên jiyana kolektîf bûn jî, hevsengiyên civakî bi derketina holê ya milk û hêzê re bi awayekî radîkal guherî. Di bingeha vê veguherînê de jî avabûna hişmendiya mêrperest heye.

Hilberîna jinan a di nav jiyanê de di xwezaya xwe de ji bo berdewamiya jiyanê û hafizaya civakê xwedî rola sereke bû. Ji ber vê yekê hişmediya mêrperest di destpêkê de êrişê vê hafizayê kir. Hêza jinan a ku hat şikandin ne tenê bû sedema newekheviya zayendan; vê şikandinê di heman demê de ji bo avabûna desthilatdarî û şeran bû bingeh jî. Lêkolînên arkeolojîk û antropolojîk ên ku li ser vê mijarê tên kirin jî nîşan didin ku di xwezaya civakê de şer tune ye. Ev lêkolîn nîşan didin ku şer bi hêz, desthilatdarî û milkiyetkirinê re eleqedar in. Li ser avakirina vê hişmendiyê û pêşxistina tundiyê civak ji nû ve teşe girtiye.

Hişmendiya mêrperast a li dijî civaka dayiksalar bi xwe re hêz afirand. Hêz veguherî desthilatdariyê. Desthilatdariyê bi xwe re milkkirinê anî. Milkkirin jî rê li ber şeran vekir. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku afirînerê şeran hişmendiya mêrperest e.

Bi milkirina ax, ajal, hilberîn û heta mirovan (bi taybet jî dîtina jinan weke milk) re newekheviyên mezin dest pê kirin. Kes ango mêrên ku di nav vê newekheviyê de pêşengî dikirin, ji bo parastina berjewendiyên xwe di nav hewldanan de bûn. Vê hewldanê bi xwe re keseyatek nû yanî kesayeta mêrê şerûd/şerxwaz afirand. Ev kesayeta şerxwaz ji hilberînê dûr bû, zordariyê meşrû dît û wek temsîlkarê desthilatdariyê bû. Ev kesayet bû kevirê bingehîn ê sazûmankirina şer.

**Her ku rola navendî ya jinan di hilberîn û jiyana civakî de kêm bû, zihniyeta ku serdestiya mêran lê hebû sazûmanî bû. Vê zihniyetê sê tiştên ku şer pêwîst dikir peyda kir:**

***Kontrol:*** Kontrola jin, zarok û tevahiya civakê

***Rewakirina tundiyê:*** Qebûlkirina êrişên li dijî dijmin (li gorî hişmendiya mêrperest), xweza û yên din xwezayî tê dîtin.

***Hîyerarşî:*** Pêwîstiya berfirehkirina domdar a desthilatdariyê

Bi vî awayî, şer êdî tenê li dijî dijminekî derve nebû, di heman demê de bû amûrek ji bo parastina desthilatdariyê li nav civakê.

Bi avakirina dewletê êdî şer bû êrişeke domdar a li ser civak, debar (bi demê re aboriya giştî) û îdeolojiyan. Bi şeran re her ku çû dewlet xurt bûn. Bi xurtbûna dewletan re jî her ku çû şer berfireh bûn. Ji ber ku her dewletek diviyabû kapasîteya xwe ya şer bi pêş bixe da ku qada xwe ya desthilatdariyê biparêze û berfireh bike. Bi vî awayî şer ji bûyerek rasthatî di dîroka mirovahiyê de veguherî amûrek sîstematîk a desthilatdariyê.

Yên ku herî zêde ji şer bi bandor bûne jî bêguman jin in. Di nav şeran de hêza jinan a civakî şikest. Ji ber ku bandora civakê şikiya, her ku çû civak ji xwezaya xwe dûr ket. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku şer encama hişmendiya mêrperest e û herî zêde jî jin û civak kirine hedef.

Di şerên ku heta niha hatine kirin de bi milyonan kesan jiyana xwe ji dest daye. Di nav şeran de ji bo serkeftinê gelek rêbaz hatine bikaranîn. Em ê di nivîsên bê de behsa rêbazên şeran bikin.


Lêkolînên arkeolojîk û antropolojîk ên ku li ser vê mijarê tên kirin nîşan didin ku di xwezaya civakê de şer tune ye. Ev lêkolîn nîşan didin ku şer bi hêz, desthilatdarî û milkiyetkirinê re eleqedar e


Cûdî Cizîr

# Bi kenê me jiyan tê hûnandin

Jiyana ji zayîn û mirinê peyda dibe, gelek tişt ji me birin û gelek tişt jî dan me. Bi kenê me re ev dergûşa ji gerdûnê re dibe cih û war, wê careke din ji dahatuya mirovatiya nû re sînga xwe vebike. Bêguman kenê me bengiyê azadiyê ye, daxwaza bêsînoriyê ye. Kenê me, tevlî çeman dibe, diherike li çiyayan asê dibe, li bajaran kom dibe, dibe derya, tav lê dide, jê hilmek hênik bilind dibe; diçe perdeya asîman diqetîne, dibe ewr, gurmîniyan li jor tîne, baranê dibarîne; axê şil û hêşîn dike.

Ev çavkanî, kenê me ye! Bila kes nebêje gaziyên şoreşê êdî nikarin tiştekî bikin, tirêjên me tûj in! Dema em gava xwe diavêjin pir xurt diavêjin. Bila kes nebêje êdî gaziyên têkoşînê nikarin bikenin, ma kî dikare weke me dilê xwe bike xaniyê stêrkan? Kî dikare deriyê wê malê vebike? Tenê kesên bedew, dilsoz, qenc û hevrêyên Apoyî dikarin dilê xwe bikin hêlîna stêrkan.

Bi kenê me re Jiyan xezîneya xwe vedike. Reng û dengê me di navbera lênûs û pênûsê de; hêvî û hestên me di nav helwesta azadiyê de ne. Lewma ken û jiyana gaziyên şoreşê romaneke mezin e. Bi qasî deryayekê fireh e. Kenê me li ser deryayê dûr û kûr diçe, dikeve nava kûrahiya jiyanê.

Divê mirov weke evîndarekê bi jiyana azad re bikene û dest ji lêgerînên xwe bernede. Bi kenê me jiyan tê hûnandin. Hêvî û hestên me xweşikî û bedewiyan diafirîne. Ken, gula rû ye. Ken, strana azadiyê ye, baskê şahiyê ye, ji hêlîna dil derdikeve, difire diçe û dirêj dibe.

Kenê me reseniya jiyanê diafirîne. Evîna me, baskê xwe li bayê welêt difirîne. Di nav asîmanê şîn re derbas dike. Bi rastî kenê me nîşaneya azadiyê ye. Em ê kenê xwe çawa li ser rûpela spî bineqişînin? Kenê me hêviyeke ku di dilên gelan de hatiye afirandin. Weke çirûskên tîrêjên berbangê xwe berdide ser deşt û çiyayan. Xweza û mirovahiyê bi hemû germahiya xwe hembêz dike. Bi her kenekî me kulîlk, çiya û deşt; mirovahî, jin, zarok bi germahiya tîrêjên rojê radibin dîlana azadiyê.

Bi taybet kenê gaziyên şoreşê hêviyên vejînê diçînin. Mîna şitleke dara çinarê her roj mezin dibe û li derdora agirê azadiyê difire. Ji lewma kenê gaziyên Kurdistanê dara dinyayê ye.

Dîmenên rengîn û xweşik li pişt xwe dihêle. Ken dibe evîn, hêvî azadî û tovên gulan hêşîn dike. Dil dihejîne, nûra çavan dide biriqandin. Bi rastî jî kenê me stêrkên li asîman ronî dike, di şevên tarî de pêşiya me ronî dike.

Rêya azadiyê nîşan dide. Kenê gaziyên têkoşîna azadiyê; di dil û mejiyê mirovan de evîna azadiyê ji nû ve dide şînkirin. Welatê rojê bi vê tevgara nûjen dilerize û zindî dibe. Bi hêviya kênê azadiyê...



Xecê Şen

# ‘Li dijî qirêjiyê têkoşîna paqijiyê’

Demeke dirêj e ku dewleta Tirkiyeyê, li Kurdistanê polîtîkayên şerê taybet bi gelek rêbazên cuda dide meşandin. Ev rêbaz gelek caran bi destê unîformayiyên dewletê yên pispor tên meşandin, an jî bûne sedem ku çeteyên madeyên hişbir û fihûşê ji wan hêz werbigirin. Ev êdî aşkere ye ku bi destê çeteyan û uniformayiyên dewletê ve her roj jin, ciwan û bi taybetî jî jinên ciwan tên kuştin. Şebekeya çeteyan a Colemêrgê û Sakîne Kulter a ku bi destê serokê Komeleya Ocaxa Tîmên Taybet a li Silopiyaya Şirnexê hat kuştin û şewitandin, mînakên herî şênber in.

Gelê kurd û saziyên kurdistanî, li dijî polîtîkayên şerê taybet ên dewletê têkoşîneke nû da destpêkirin. 26ê nîsana 2025an, di bin hevserokatiya saziyên demokratîk ên Amedê de bi navê ‘Şiyar Be! Platforma Tekoşîna Li Dijî Tiryakê’ hat damezrandin. Li ser têkoşîna li dijî hişbirê, xebatên bi ciwan û malbatan re, em bi endama Plarforma Şiyar Be Emîne Kaya re axivîn.

Emîne Kaya di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser hevdîtina Platforma Şiyar Be ya bi malbat û ciwanan re û got: “Wek Platforma Şiyar Be, me ji bo hişbirê bi gel re gelek hevdîtin kirin, civîn pêk anîn, malbat ziyaret kirin û me bi malbatan re li ser hişbir, fihûş, rê û rêbazên ku çeteyên van karan dikin û serî lê didin çi ne nîqaş kir. Ji ber vê sedemê ez dixwazim li gorî nêrînên gel biaxivim. Gel wiha dibêje: “Çeteyên ku hişbirê difiroşin û fihûşê dikin, em li ber çavên xwe dibînin. Me gelek caran ew şikayet kirine, lê mixabin şikâyetên me encam nagirin û bê bersiv dimînin. Jixwe em gelek caran dibînin ku polîs bixwe jî bi van çeteyan re ne.’’ Wekî ku bi wan re di nav karbeşiyê de bin nêrîneke wisa didin xuyakirin. Ji ber ku em kurd in, ji ber ku em di warê siyasî de wek wan nafikirin, hişbirê tînin nav taxên me. Dema ku em çûn taxan û gundan me ev yek baş dît. Divê em pirseke wisa jî xwe bikin, çima ewqas hişbir belav bûye û ketiye her cihê ku ciwan lê hene? Divê em wek sazî, dezgeh û malbat bersiva vê pirsê bidin. Eger me zarok û ciwanên xwe ji nirxên wan ên herî bingehîn di serî ji ziman, çand û nirxên civakî dûr xistibe û em ciwanên xwe apolîtîk hiştibe, ev di serî de sûcê me hemûyan e.”

Emîne Kaya di axaftina xwe de destnîşan kir ku li Tirkiyeyê bi rêya teknolojiyê hişbir û fihûş zêde bûye û got: “Îro li Tirkiyeyê û bi taybet jî li Kurdistanê hişbir belav bûye û roj bi roj zêde jî dibe. Ji ber karê hişbirê bi awayekî sistematîk tê kirin û tê belav kirin. Rêbazeke din a hişbir û fihûşê heye ku xwe digihîne mirovan ew jî teknolojî û amûrên teknolojiyê ne. Li gor analîzên ku şaredariyê li serê kiriye, em dinihêrin ku hişbir li her derê heye. Ji bo vê malbarkirina malbatan a ji taxekê yan jî ji gundekî ne çareserî ye. Lewra em nikarin tenê bibêjin ku hişbir tenê di nav gelê xizan de heye, na, hişbir di nav dewlemend, siyasetmedaran de jî heye. Mixabin hişbir wek nexweşiyê di nav hemû beşên civakê de belav bûye. Belê me behsa nexweşiyê kir, lê em hemû baş dizanin li hember nexweşiyê panzehir jî heye.”

Emîne Kaya derheqê paqijî, parastin û jiyana komunal de ev tişt anî ziman: “Ji bo tedbîrê cihên werzîşê hatin çêkirin. Aliyê din jî cihê ku ji gel re vekiriye yên wek parkan divê parastina wan bêkirin û divê şaredarî notirvanên şev û rojê li parkan bide bicihkirin. Divê me ji bo paqijiya park, tax û gundên xwe kampayayên paqijiyê bidin destpêkirin. Divê em li dijî qirêjiyê têkoşîna ji bo paqijiyê bidin. Divê cihê civakê re vekirîne bê parastin û paqij kirin. Dema ku çete ketin taxê, eger ku hejmara wan 5 kes be, hemû şêniyên taxê dikarin bi sedan li hev kom bibin û taxa xwe ji çeteyên hişbir û fihûşê biparêzin. Ev hêza gel heye em vê yekê dizanin. Wê demê dê çete nikaribin li hember hêza gel derkevin. Her wiha rêbazeke din a parastinê heye, ew jî xwebirêxistinkirin û avakirina jiyana xwe ya komunal e.”

Emîne Kaya bang li malbatan kir ku bi wan re di nav têkilî û hevkariyê de bin û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Em dizanin gelek malbat naxwazin xwe deşîfre bikin dibêjin ‘Dema ku em xwe deşîfre bikin mirov û civak ji me dûr bikevin dikevin.’ Daxwaza me ya ji gel û malbatan ev e ku nekevin fikarên bi vî rengî û di derûniyeke wisa de nemînin, her tim hişyar bin û bi platformê re di nav têkilî û hevkariyê de bin. Her wiha xwe birêxistin bikin û li dijî polîtîkayên şerê taybet û hişbirê têbikoşin û jiyana xwe ya komunal ava bikin. Di vî warî de em ji malbat û ji ciwanan alikariyê dixwazin.”



# ‘Dem dema azadiya Birêz Ocalan e’

Hevserokê OHDa Amedê Muhîttîn Muguçî diyar kir ku Tirkiye li gorî biryara DMMEyê tev nagere û got: “Polîtîkayên tecrîdê didomin. Dem hatiye ku Tirkiye zagonan biguherîne û Birêz Ocalan bigihîje azadiya fizîkî. Dema azadiyê ye.”

| Xêcê Şen



Hefteya Mafên Mirovan 10-17ê kanûnê e. 77 sal berê, 1948, Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî beyannameya gerdunî ya mafê mirovan amade kir. Bi vê beyannameya ku ji 30 xalan pêk tê, mafên mirovan ên gerdûnî hatin diyarkirin. Tirkiye jî ev beyanname îmze kiriye. Lê her çend Tirkiyeyê jî ev beyanname îmze kiribe, hêj mirov ji ber fikrên xwe tên girtin, ziman, çand tên xedexekirin û mirov nikarin bi zimanê xwe perwerde bibin.

Hevserokê şaxa Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (OHD) a Amedê Muhîttîn Muguçî, bi minasebeta hefteya mafê mirovan li ser mafê hêviyê nirxandin kirin. Muhttîn Muguçî diyar kir ku her sal di navbera 10-17ê kanûnê de ev hefte tê pîrozkirin û got: “Saziyên sivîl, demokrat û rêxistinên ku dixwazin mafên mirovan bi pêş bixin vê hefteyê bi çalakiyên cihêreng pêşwazî dikin.”

**Zagon hene pratîk tune ye**

Muhîttîn Muguçî li ser zagonên Tirkiyeyê, mafên jin, zarok û xwezayê jî rawestiya û got: “Mafê mirovan li Tirkiyeyê di asteke xerab de ye. Di rêzikname û zagonên hiqûqî de hurmeta ji bo mafê mirovan hatiye nivîsandin. Mafê mirovan bi zagonan hatiye misogerkirin. Lê di pratîkê de tune ye. Ev jî berdewama pergala redkirina pirrengiyê ye. Lewma her çiqas zagon mafê mirovan misoger bikin jî, di pratîkê de nayê qebûlkirin. Pergaleke qirêj li ser înkara jinan hatiye avakirin. Çima dewlet di zagonên xwe de li ser kuştina jinan ranaweste? Ji ber ku di hişmendiya xwe de mafê nasnameya jinan red dike.”

Muhîttîn Muguçî da zanîn ku mekanîzmayên wan jî bo jinan çareseriyê bi pêş naxe û wiha pêde çû: “Mafên jinan pir tên binpêkirin û mafên zarok jî. Divê zarok bên parastin. Zarok nikarin mafên xwe biparêzin û gelek astengî li pêş wan hene.”

**Qirkirina xwezayê**

Li ser qirkirin, talankirin û parastina xwezayê jî Muhîttîn Muguçî got: “Parastina xwezayê mafekî bingehîn e. Lê em li xwezayê xwedî dernakevin. Loma ew jî li me xwedî dernakeve. Xweza dibêje ‘Zimanê min tune ye, ez nikarim bibêjim. Dema hûn zirarê didin min, berî her tiştî hûn zirarê didin xwe.’ Mînak hefteya borî li gundê Çinarê ji bo kana madenê leşkeran avêt ser gund. Dema ku min li wî wêneyî nihêrî operasyonên siyasî yên KCKê û êrişên polîsan ên li ser saziyên sivîl û taxan, hatin bîra min. Ev mînak rewşa pêvajoya aştyê radixe ber çavên me.”

**Êdî dema azadiya fizîkî hatiye**

Muhîttîn Muguçî li ser rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan axivî û wiha domand: “Di 2009-2010an de Dadgeha Bilind a Ewropayê ji Tirkiyeyê re got, ‘Tu nikarî cezayê giran ê heta hetayê bidî mirovan. Tu mecbur î rê û rêbazan biguherî û Birêz Ocalan azad bikî’. Lê li gorî biryara DMMEyê ya mafê hêviyê tevnagerin û wî azad nakin. Polîtîkayên tecrîdê didomînin. Rêberê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan di vê pêvajoyê de bi rola xwe rabû. Êdî dem hatiye ku dewlet zagona bingehîn derxîne û Birêz Ocalan azad bike.”

**Dê rêzeçalakiyan pêk bînin**

Muhîttîn Muguçî herî dawî xwest her kes li pêvajoya aştiyê xwedî derkeve û got: “Bi boneya hefteya Mafê Mirovan li Amedê saziyên wekî OHD, ÎHD, TÎHV, Baroya Amedê, Komeleya Rosayê, Odeya Bijîşkan kom bûn. Me lijneyek ava kir. Em ê hefteya 10- 17ê kanûnê rêzeçalakiyan li dar bixin. Em ê bi dirûşma ‘Mafê Aştiyê’ ji qada Şêx Seîd heta bircên Sûrê bimeşin. Em ê li dijî polîtîkayên ku dewlet li ser girtiyên zindanan dide meşandin, li ber girtîgeha Tîpa E ya Amedê daxuyaniyekê bidin. Em ê balê bikişînin ser binpêkirina mafê mirovan, jin, zarok, xwezayê û panel, sempozyuman li dar bixin. Em bi boyena hefteya mafê mirovan bang li gelên cîhanê dikin ku li mafê aştiyê û azadiyê xwedî derkevin. Em dixwazin her kes ji bo mafê xwe têbikoşe û mafê xwe biparêzin.”

---

# Di saleke HTŞê de zêdeyî 8 hezar sivîl hatin kuştin

| Sosin Gulo

HTŞê, 27ê mijdara 2024an, li dijî Şehba, Heleb, Hims û Hemayê dest bi êrişan kir û piştre 8ê kanûna 2024an, dest danî ser hikûmeta Şamê. Piştî HTŞê hikûmet xist destê xwe, kuştin û revandina mirovan zêde bû. Ji destpêka ku HTŞ hat ser hikûmetê, heta 25ê mijdara 2025an, li seranserî Sûriyeyê 10 hezar û 955 kes hatine kuştin. Ji wan 8 hezar û 422 sivîl in. Di nav wan de 463 zarok û 636 jin hene.

Ji dema ku Heyet Tehrîr El Şam hat ser desthilatê û heta 25ê mijdara 2025an, 751 jin li deverên di bin kontrola wê de hatin kuştin, revandin an jî wendakirin. Tenê li Siwêdayê 130 jin hatin kuştin. 520 kuştinên din li Şam û gundewarên wê, Hama, Hums, Lazkiye, Tartus, Idlib û Helebê pêk hatin. Sedemên wan ji teqînên ku ji ber bermahiyên şer, gulebaranên ketober û kuştinên tolhildan an jî mezhebî, ji bilî kuştinên ku ji ber tundiya navmalî û civakî pêk tên.

Di meha mijdarê de li Efrînê 5 kes hatin kuştin û 6 kes birîndar bûn, nêzî 8 hezar û 700 dar hatin talankirin. Çavdêrîgeha Mafê Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) hejmara qurbaniyên komkujiyê ya li parêzgeha Suweydayê ji destpêka pevçûnan heta tîrmehê belge kirin. Li gorî belgeyan heta niha navê hezar û 120 kesan ji aliyê hemû deveran ve hatiye piştrastkirin.

SOHRê mirina 232 kesan di mijdara 2025an de belge kir. Di belgeyan de da zanîn ku 200 kesên sivîl hatine kuştin û ji wan 20 jin û 31 zarok in.

Meha mijdarê, kesên ji ber cebilxaneyên şer (bermahiyên şer) hatine kuştin 46 jê zarok bi giştî 61 sivîl hatine kuştin. SOHRê di mijdarê de 20 êrîşên ku ji aliyê DAIŞê ve li deverên di bin kontrola HSDê de hatine kirin belge kirin.

Tevî vê rewşê jî rêxistinên ku binpêkirinên li dijî jinan belge dikin tune ne û hikûmeta veguhêz jî bidestxistina agahiyan asteng dike.

Li bajarên cuda yên Sûriyeyê bi dehan jin û jinên ciwan bi awayekî biguman ku sedemên wan nayên zanîn, hatin revandin. Ji bo wan tu lêpirsîn û lêkolînên nehatin kirin da ku li aqûbeta wan bipirsin.

Divê bê bibîrxistin ku rêberiya Trump bi awayekî fermî, 7ê tîrmeha 20225an, HTŞ ji lîsteya terorê derxist.

# Serdest her roj mafên mirovan binpê dikin

| Navenda Nûçeyan

Di 11 mehên 2025an de bi hezaran caran mafên mirovan hatin binpêkirin. Tenê di 6 mehên ewil ên salê de mafên Hezar û 820 mirovan hatin binpêkirin û 42 welatî bi guman hatin kuştin. 286 welatî jî rastî îşkenceya polîs û leşkeran hatin.

10-17ê kanûnê, hefteya mafên mirovan e. Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) di hefteya mafên mirovan de raporên binpêkirina mafan aşkere dike. Ji raporên 6 mehên ewil ên 2025an ên ÎHDê xuya dike ku dê îsal bîlançoya binpêkirina mafan dîsa giran be.

**Li gorî rapora 6 mehên ewil**

Li girtîgehên herêma bakurê Kurdistanê girtiyek ji ber nexweşiyê mir û 3 girtiyan jî bi îdiaya întîxar kiriye mirin. Li bakurê Kurdistanê di 6 mehên ewil de 10 zarok, 23 jin, 9 mêr herî kêm 42 welatî bi awayekî biguman mirin. Di 6 mehên ewil de zarok jî di nav de herî kêm 286 welatî rastî îşkenceya polîs û leşkeran hatin.

***Dîsa di 11 mehên borî de çend binpekirinên derketin pêş wiha ne:***

Parlamenterê DEM Partiyê Alî Bozan li girtîgehên Antalya û Bûrdûrê lêkolîn kir û diyar kir ku ji ber lêgerîna hundirîn ev 3 sal in hin girtî nikarin biçin nexweşxaneyê. Hevseroka Şaxa ÎHDa Îzmîrê Zîlan Gumuş jî diyar kir ku li girtîgehên bi ewlekariya bilind û girtîgehên Tîpa Syê hemû girtî li gel girtiyên muebeda girankirî di heman qawişan de tên ragirtin.

Parêzvanên mafên mirovan li Enqereyê der barê rewşa Girtîgeha Tîpa F a Kurkçulerê û Girtîgeha Hejmar 1 a bi Ewlekariya Bilind a Sûlûcayê de destnîşan kir ku li girtîgehan tecrîd û îşkence heye û girtî rojê tenê dikarin 1 saetê derkevin hewşê.

Endezyarê elektrîk-elektronîkê Şahîn Agralî ku di salên zanîngehê de ji ber beşdarî çalakiyên demokratîk bû hat darizandin û ceza lê hat birîn. Lê 10 sal in ji ber dozan nikare karê xwe bike.

Saziyên hiqûqî û sivîl ên li Wanê, li ser 9 girtîgehên herêma Serhedê û Rojhilatê Deryaya Reş rapor amade kir. Di raporê de hat diyarkirin ku li hemû girtîgehan veguhastina nexweşxan dereng tê xistin û di hin rewşan de jî veguhastin qet pêk nayê. Li hin girtîgehan ji ber ku girtî kontrolên dev û kelepçeyan qebûl nakin, ambargoya pirtûkan datînin ser wan. Dîsa pirtûk û nameyên kurdî bi bahaneya ‘nayên tercûmekirin’ nadin girtiyan.

Rojnameyên mixalif ên wekî Yenî Yaşam, Evrensel û Bîrgunê jî nadin girtiyan û şopandina qenalên televîzyonê yên mixalif jî bi teknîkê hatiye astengkirin. Xwarin hindik didin girtiyan. Qedexeyên qurs, atolye û aktîvîteyên sporê yên ji ber pandemiyê hatine ferzkirin hê jî di meriyetê de ne.

**Polîsan 65 zarok binçav kirin**

Li gorî agahiyên ku endama Komîsyona Zarokan a ÎHDa Amedê Berfîn Elçî, 20ê mijdarê Roja Mafên Zarokan de parve kir, di salekê de 192 bûyer pêk hatin û herî kêm 4 zarok hatine kuştin û 51 zarok jî birîndar bûne. Di vê demê de 13 zarok bi awayên guman mirine. Herî kêm zarokek teşebusî întîxarê hatiye kiriye. Di nav salekê de herî kêm 4 zarok bi tundiya di nav malbatê de mirin û zarokek birîndar bûye. 20 zarok bi îstîsmara zayendî re rû bi rû mane, zarokek hatiye revandin. 65 zarok hatine binçavkirin, herî kêm 11 zarok hatine girtin. 5 zarok jî di binçav de tundî li wan hatiye kirin. Zarokek dema xebatê birîndar bûye û 5 zarokan jiyana xwe ji dest daye. Di navbera salên 2024 û 2025an de 192 bûyer pêk hatine.

**Binpêkirina mafan a 2024an**

Di 2024an de li gorî tespîtên Navenda Dokumantasyonê ya Navenda ÎHDê herî kêm mafê jiyana 6 hezar û 94 kesan hat binpêkirin. Di heman salê de 434 kes jî birîndar bûn.

Li gorî tespîtên navenda dokumantasyonê di heman salê de di şerê çekdarî û operasyonên leşkerî de 10 jê sivîl, herî kêm 3 hezar û 262 kes hatin kuştin. Di şer de hezar û 491 kes li başûrê Kurdistanê di operasyonên leşkerî de hatin kuştin. Hezar û 579 kes jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di operasyonên leşkerî yên Tirkiyeyê de hatin kuştin.



**Polîs û leşkeran 9 welatî kuştin**

Di heman salê de dîsa leşker û polîsan di 15 bûyerên cuda de gule reşandin û di van bûyeran de 9 kes hatin kuştin û 10 kes jî birîndar bûn. Cerdevanan jî di salekê de 18 welatî birîndar kirin.

Di 2024an de li girtîgehan herî kêm 27 kes ji ber ku nehatin berdan ji ber nexweşiyan mirin. Di êrişan de jî 16 kes ji aliyê kesên nasnameya wan nediyar ve hatin birîndarkirin. 4 kes ji wan mirin. Di eynî salê de, herî kêm 7 leşker biguman mirin. Dîsa 5 cerdevan û 6 polîs bi awayekî biguman mirin.

Di 2024an de herî kêm 103 zarok ji ber binpêkirina mafan mirin. Li gorî daneyan di heman salê de di sala borî de 378 jin hatin kuştin. Dîsa di 2024an de bi giştî hezar û 897 karker mirin, 2 hezar û 651 kes jî rastî îşkenceyê hatin. Xuya ye ku binpêkirina mafan dîsa zêde dibe.

## SÎNEMAGERÊN KURD ÊŞÊN GEL BI RÊYA SÎNEMAYÊ NÎŞAN DAN

# Festîvala li Amedê li dijî faşîzmê ye




Alî Guler

*Festîvala Fîlman a Amedê xwedî mîrateyek 13 salî ye. Lê mixabin ji ber zext, sansur û qeyûman di nav vî 13 salî de tenê 2 caran pêk hat. Tevî vê jî sînemagerên kurd ti carî teslîmî vê zilmê nebûn, di her şert û mercî de fîlman çêdikin û nîşanî temeşevanan didin. Piştî 8 salan cara 3yemîn, Festîvala Fîlman a Amedê îsal di navbera 7 û 14ê kanunê de tê lidarxistin.*

*Festîval bi dirûşma 'Dinya bi çîrokan tê ba hev' tê li darxistin. Dê bi giştî 84 fîlm bên nîşandan û deriyê festîvalê jî bi belgefîlma, 'Bi Kardeş Turkuler re 30 sal' vedibe. Fîlm ji aliyê Çayan Demîrel û Ayşe Çetînbaş ve hatiye kişandin. Ew bi rêya vê belgefîlmê behsa koma muzîkê 'Kardeş Turkuler' dikin. Tê zanîn ku ev kom bi kurdî, tirkî, erebî, çerkezî, ermenî û bi gelek zimanan din stranan dibêje. Ji bo wê jî wek reng û dengê Mezopotamya û Anatolyayê tê naskirin. Ev reng û deng êdî li ser perdeya spî ye. Fîlm her wiha behsa dîroka nêzîk a 30 salî û bûyerên polîtîk jî dike ku li Tirkiye û herêmê qewimîne .*

*Dîrektora Festîvala Fîlman a Amedê derhêner Lîsa Çalan, ji rojnameya Xwebûnê re behsa dîroka festîvalê, rewşa sînemeya kurd û zextên li ser wê kir.*

***Festîvala Fîlman a Amedê kengî û çawa dest pê kir? Ev pêwîstî ji ku derê derket?***

Festîvala Fîlman a Amedê sala 2012an de dest pê kir. Bêguman ji ber gelek pêwîstiyan hat destpêkirin. Ya herî girîng jî ev e; em dizanin ku ji salên 2000î şûnve di sînemaya kurdî de pêşketinek derket holê, gelek ciwan û sînemagerên kurd xwestin çîrok û êşên gel bi rêya sînemayê nîşanî civakê bidin. Ev heta astekê hat kirin. Lê li vir pirsgirêka pêşkêşkirina van fîlman derket holê. Bi teybetî jî li Tirkiyeyê nîşandana van fîlman gelek zehmet bû. Ji bo wê jî li Amedê biryara festîvalek wiha hat wergirtin. Destpêkê de biçûk û tengtir bû, lê ji ber ku sala ewil bi eleqeyek gelek bicoş derbas bû, ev tişt hevalan motîve kir û cesaret da wan. Lewma hevalan festîvalê bi dilrehetî organîze kir.

Ji ber vê jî festîvala 2yemîn ji ya yekemîn xurttir û berfirehtir derbas bû. Lê sala 2015an, dema amedekariya festîvala 3yemîn, mixabin qeyûmên şaredariyan sazî û dezgehên çandî yên Amedê û herêmê desteserkirin û ji ber vê jî ev xebat hatin rawestandin.

Hetanî îro jî derfet nebûn ku bê çêkirin. Îsal em Festîvala Fîlman a Amedê ya 3yemîn li dar dixin. Festîval di navbera 7-14ê kanûnê de dê pêk were. Eleqeyeke pir mezin heye, bi rastî jî em kêfxweş in. Piştî 8 sal lidarxistina vê festîvalê ji bo me gelek girîng e.

***Em dizanin ku li gelek deverên cîhanê sînema rastî polîtîkayên faşîzan hatiye û tê. Gelek festîval û mîhrîcanên fîlman rastî astengiyan hatine. Mînak Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Cannesê sala 1939an ji ber Şerê Cîhanê yê 1emîn û êrişên faşîzan nayê li darxistin. Festîvala we jî ne bi heman şêwazê be jî ji ber astengiyan 8 sal hatiye rawestandin. Hûn di vê warî de dikarin çi bêjin?***

Bi rastî eger mirov dema li dîroka sînemaya cîhanê binêre, gelek mînakên bi vî rengî dikarin bên rêzkirin. Sînemaya ne li gorî sîstemê be her dem rastî zextan hatiye. Li Tirkiyeyê jî ev rewş wisa ye. Ji sînemaya 'Yeşîl Çam'ê vir de di serî de kurd û gelek beşên civakê hedef hatine girtin. Jiyana kurdan, rewşa jinên kurd, şexsiyet û hestên wan di vê sînemayê de bi awayekî neyinî hatine nîşandan. Ev sed sal in bi rêya sînemayê li ser kurdan faşîzmeke mezin hatiye meşandin. Kurd îro bi heman şêweyê yanî bi rêya sînemayê dixwazin van polîtîkayan pûç bikin. Ji bo wê ciwanên kurd fîlmên berxwedêr çêdikin.

Çeka me ya herî bihêz îro fîlm û sînema ne. Em bi vê rêyê çîrokên gelê xwe tînin ser perdeya spî û nîşanî raya giştî didin. Ez wek Lîsa bi dilekî rehet dikarim bêjim ku sînema çeka min e. Ez tenê bi vê rêyê dikarim behsa bîrdozî û felsefaya xwe bikim. Di wê baweriyê de me ku piraniya sînamegerên kurd jî di vê hişmendiyê de ne. Dixwazin rewşa kurdan û çîrokên xwe belge bikin. Derdê me ev e. Ji ber ku cîhan çavên xwe li me girtiye. Di vê kêliyê de derketina van festîvalan jî parçeyek vê berxwedanê ye. Em dikarin fîlmên hatine kişandin, bi vî awayî nîşanî gelê xwe bidin. Ji bo wê jî gelek girîng e.

***Dê li vê festîvalê bi giştî çend fîlm bên nîşandan?***

Festîval 7 rojan berdewam dike. Bi giştî 84 fîlm tên nîşandan. Nîviyên fîlmên festîvalê fîlmên kurdî ne, nîviyên din jî ji sînemaya navneteweyî ne. Ji fîlmên kurdî, 17 fîlm metrajdirêj in, 12 jî kurtefîlm in. 7 an 8 belgefîlm hene. Vekirina festîvalê jî bi belgefîlma 'Bi Kardeş Turkuler re 30 sal ' a Çayan Demîrel û Ayşe Çetînbaş çêkirine, wê were destpêkirin. Em fîlmên di 8 salên dawî de hatine kişandin nîşan didin. Panaromeyek 8 salî ye. Ji ber ku ev 8 sal in festîval nehatiye çêkirin. Em dixwazin van fîlmên hatine kişandin, nîşanî gelê xwe bidin. Ji bo fîlmên navneteweyî jî wisa ye. Bi gelek festivalên navneteweyî re me hevkarî kiriye û di wê çarçoveyê de fîlm werin nîşandan.

Festîvala Fîlman a Amedê ya 3yemîn piştî 8 salan tê li darxistin. Dîrektora festîvalê Lîsa Çalan, bal kişand ser rewşa sînemaya kurdî ya li Tirkiyeyê û got: 'Ji ber zext û qeyûman ev 8 sal in festîval nayê lidarxistin. Li hemberî sînemaya kurdî polîtîkayên faşîzan tên meşandin. Lê dîsa jî nikarin me asteng bikin.'

Dîsa em di festîvalê de belgefîlmek 'Fanon 100 sal' nîşan bidin. Di aliyê din de jî li ser kolonyalîzmê panelek me heye. Em dixwazin vê mijarê jî nîqaş bikin. Ji ber ku rewşa em îro tê de heman tişt e. Gerek em li dijî kolonyalîzmê têkoşîna wekheviyê û edeletê bidin.

***Ji bo qebûlkirina fîlman krîtêrên festîvalê çi bûn? Li ser çi esasî we fîlm diyar kirin?***

Bêguman gelek krîterên ji bo festîvalên cîhanê yên navneteweyî derbas dibin ji bo me jî girîng in. Pîvanên sînemayê, ziman û nêzîkbûn in. Ev krîterên giştî ne. Lê li aliyê din gelek tiştên taybet jî hene. Mînak; di sînemayê de û di fîlman de şîrovekirina mijarên jin, xweza û civakê. Eger di fîlmekê de jin were biçûkxistin, an jî wek figûrek klasîk bê dîtin, em wê fîlmê qebûl nakin. Dîsa nêzîkatiya li mafên mirovan û nêzikatiya cudahiyên gelan divê ne neyînî bin. Heke nêzikatiyeke bi vî rengî hebe ne pêkan e ku em wan fîlman qebûl bikin. Ev xalên me yên sor in. Wekî din deriyê me ji hemû fîlman re vekiriye.

***Di nav 13 salan de ev festîvala 3yemîn e ku hûn li dar dixin. Te behsa festîvala yekemîn û duyemîn kir. Hûn îsal li benda eleqeyek çawa ne?***

Ez dikarim bêjim; li Tirkiyeyê gelek festîval têk diçin. Hesasiyeta sînemayê û hunerê nemaye. Rizîbûnek heye. Ji bo wê jî gelek sînemagerên Tirkiyeyê berê xwe dane me, yanî Amedê. Çavên wan li me ye, dinêrin em çi dikin, em ê çi bikin. Ev jî nêrin û felsefeya me ya jiyan û sînemayê nîşanî cîhanê dide.

***Ji bo sînemaya kurdî rol û mîsyona festîvalên fîlman çi ne?***

Bi rastî jî gelek girîng e. Mînak em li Kurdistanê tenê fîlmên kurdî nîşan nadin. Filmên navneteweyî jî nîşan didin. Hinek berfirehtir e. Lê li diyasporayê mîhrîcanên bi vî rengî girîngtir in. Di navbera sînameger û temaşevanan de rola pirê radibe. Gelek aliyên wê yên erênî hene.

Bi rastî jî em sînemagerên kurd ji hev dûr in. Ji bo wê jî ev festîval girîng in. Ev berî her tiştî lobiyekê çêdike. Sînameger ji 4 parçeyên Kurdistan û derve tên gel hev. Didin û distînin, behsa projeyên xwe dikin û di navbera wan de têkiliyek çêdibe. Ev jî bi xwe re motîvasyon û xwestekek pozîtîf derdixe holê. Fîlmên hevdu dibînin û bi zimanê sînemaya li hevdu dihesin. Ev jî ji bo sînemaya kurdî tiştên gelek erênî û baş in.

***Li gor te îro rewşa sînemayê çi ye û tu rewşa sînemaya kurdî ya îro çawa dinirxînî?***

Li hemû cîhanê sînema di asta jor de ye. Her sal fîlmên cur bi cur tên kişandin. Lê mixabin yên me em hîna jî ji bo hebûnê têdikoşin. Ev tişt tenê ji bo sînemaya kurdî ne derbasdar e. Ji bo hebûna gelê me jî wisa ye. Li ser gelê me nasname û hebûna me zilm û zext berdewam in. Mixabin sînema jî para xwe ji vê zilmê werdigire. Ji bo wê jî her çiqas zext, sansur û bêderfetî hebin jî sînamegerên kurd di nava hewldanekê de ne. Her sal bi dehan fîlm tên çêkirin. Her çiqas ji ber rewşa aborî fîlmên metrajdirêj kêm bin jî belgefîlm û kurtefîlm têra xwe tên çêkirin. Ev hewldanek baş û serkeftî ye, hêviyê dide.

Wek sernivîsek navber; mînaka Rojava bi rastî jî gelek girîng e. Li wir gelek fîlm tên kişandin û liv û tevgereke sînemayê heye. Herî dawî Festîvala Fîlman a Rojava hat lidarxistin û gelek bi serkeftî derbas bû. Ji qada navneteweyî jî eleqeyek mezin çêbû. Bi rastî ji bo sînemaya kurdî ev gavên gelek baş in.

***We behsa aboriyê kir. Gelo ji bo çi wezareta çandê ya Tirkiyeyê fon nade sînemagerên kurd?***

Hetanî niha ev sîstem çand, ziman û hebûna kurdan qedexe kirine û tune hesibandine. Ev hişmendî îro jî berdewam e. Ji bo wê jî ev sazî ti alîkarî nade projeyên sînamegerên kurdî. Ne tenê sînamegerên kurd, kesên fîlmên alternatîf û derveyî sîstemê çêdikin jî nikarin alîkariyê werbigirin. Eger behsa xweşk û biratiyê, wekhevî û aştiyê tê kirin, gerek êdî sînamegerên kurd jî ji vê saziyê alikariyê werbigrin. Ev tiştekî xwezayî ye û mafê me ye.

# ROMANA BERÊ ME LI TIRSÊ: 'TIRS' û zimanê dayika min

Herdem Merwanî

**Gava min dest bi xwendina vê berhemê kir, ew bû perçeyek ji jiyana min, di navbera min û rûpelan de meraq û kelecanek wisa çêbû ku min nexwest qet navberê bidim xwendinê**

Fûara pirtûkan a Amedê, bi neh rojên xwe yên tijî, bû mizgîniyek ji bo dilê pirtûkhezan. Di vê fuarê de, pirtûkxaneya min bi gelek berhemên nû yên kurdî, wekî roman, helbest û çîrokan, dewlemendtir bû. Hin pirtûk bi ziman û ruhê xwe yê zindî, dil û hişê min têr dikin; ew dibin sedem ku ez zêdetir bixwînim, carcaran wan dubare vekim û li nav rûpelên wan bigerim. Lê mixabin, hin pirtûk jî hene ku bi ziman û naveroka xwe, wekî kevirekî giran, li ser dilê min dikevin û hewesa min a xwendinê dişikînin.

Gava ez hewl didim pirtûkên wisa bixwînim, xwendin li min giran dibe. Hevok û gotinên wan, wekî ku bi zorê li ser kaxiz hatibin danîn, dilê min diêşînin. Rûpel di nav destên min de dibin bar û pirtûk bi mehan di nav lepên min de dimîne, bêyî ku biqede. Erê, nivîskar kurd e, ziman kurdî ye; lê tiştên ku têne qalkirin, jiyanek biyanî ye. Di nav wan hevokan de ez xwe nabînim; ne dayika min, ne zaroktiya min, ne gundê min, ne bajarê min, ne jan û ne jî bextewariyên min tê de hene. Ez dibim biyaniyê pirtûkê û ev yek rê li ber xwendina pirtûkên din jî digire.

Ev sekin û hişmendiya hin nivîskaran, astengiyekê di navbera me û pirtûkan de çêdike. Ji ber vê yekê, piştî fûara pirtûkan a Amedê, min biryar da ku divê ez pirtûkekê hilbijêrim ku ruhê min bi xwendinê re li hev bike, kelecan û germahiya navbera min û pirtûkan geş bihêle. Min xwest berhemek wisa bixwînim ku tîna min a ji xwendinê bişikê, dilê min bi zimanê dayika min ve girê bide. Wisa bû ku min biryara xwe da: Pirtûka yekemîn a ku min hilbijart, romana "TIRS" a Roger Sozdar bû ku nû li weşanên Bêjingê hatibû çapkirin.

Piştî vê biryarê, di dilê min de tirs û gumanek biçûk çêbû. Heger ev pirtûk jî bi zimanê kurmancî be, lê hişmendiya wê biyanî be? Wê demê, dibe ku ev pirtûk jî bi mehan di destên min de bimîne, ez û rûpelên wê bi hev re şer bikin û dora xwendina pirtûkên din neyê. Lê wekî ku dilê min hêvî dikir, ev tirs bêbingeh bû. Romana "TIRS" ji bo min bû cihê kêfxweşî û hezkirinê.

Gava min pirtûk hilda destê xwe û dest bi xwendinê kir, wê demê pirtûk bû parçeyek ji jiyana min. Di navbera min û rûpelan de meraq û kelecanek wisa çêbû ku min nexwest qet navberê bidim xwendinê. Zimanê pirtûkê, zimanê dayika min bû; erdnîgariya min, çanda min, bîranînên min tê de bûn. Roger Sozdar bi zimanekî zelal, xwezayî û kurdewar romaneke wisa nivîsandibû ku her gotin, her hevok wekî zêr di dilê min de dibiriqî.

Gotinên wî, wekî avê diherikîn, bêyî ku min aciz bike yan biyanî bimînim. Zimanê wî, zimanê ku min ji dayika xwe hîn bûbûm, bû pirek di navbera min û çanda min de.

Romana "TIRS" ne tenê qala çîrokekê dike, qala jiyana me, bajar û gundên me jî dike. Lehengên romanê ne bi hişmendiyeke biyanî hatine afirandin, lê bi ruhê kurdî, bi têgihiştina me hatine hûnandin. Sozdar qala wê tirsê dike ku em gelek caran bûne şahidê wê: tirsa ku me di kêliyên dijwar de, li ser rûyê nas û dostên xwe dîtî ye; tirsa ku di êrîşên ser malan, li ber deriyê dadgehan, di qereqolan û di hucreyên îşkencexaneyan de bûye parçeyek ji jiyana me. Ev tirs, bi qasî berxwedana me, rastiyeke jiyana me ya mezin e. Lê mixabin, ev aliyên jiyana me di wêjeya kurdî de kêm hatine nivîsandin.

Roger Sozdar, bi sekin û hişmendiyeke xas a kurdî, ev rastî bi awayekî wisa zindî kiriye ku xwîner xwe di nav bûyeran de hîs dike. Di sê rojan de min pirtûk xilas kir, lê gava xelas bû, min got: "Xwezî ev pirtûk qet xelas nebûya!" Hişê min hê li ser wan bûyeran bû, ez hê di wan kolanan de, di wê tarîtiya tirsê de bûm. Bandora pirtûkê çend rojan li ser min ma û ev yek ji bo min bû delîlek ku romana "TIRS"ê ne tenê pirtûkek e, lê serpêhatiyek e ku dil û ruhê xwîner digire.

Bi vê romanê, Roger Sozdar hêviyeke mezin da min. Êdî ez bi romana kurdî bawer im. Ez bawer im ku nivîskarên wekî Sozdar, yên ku xwediyê û şahidên bûyerê ne, dikarin bi zimanê dayika min tirs, berxwedan, henek û sohbetên me bi awayekî kurdewar binivîsin. Di romanê de, her tişt bi çanda me, bi zimanê me hatiye hûnandin û ev yek "TIRS"ê dike berhemek bêhempa.

Ez zêde naxwazim pesnê nivîskarê me bidim, çimkî "TIRS" bi xwe pesnê xwe dide. Ev romanek e ku divê di pirtûkxaneya her maleke kurd de hebe, divê were xwendin û bi dilê çavên xwîneran bê dîtin. Ji ber vê yekê, min zêde qala naveroka pirtûkê nekir; dixwazim hûn bixwe bi dest bixin, bixwînin û wê demê hûn ê maf bidin min.

**Roger Sozdar kî ye?**

Roger Sozdar, sala 1985'an, li gundê Têco yê navçeya Qereyaziyê ya Erziromê ji dayik bûye. Di salên zanîngehê de dest bi xebatên çandî û hunerî kiriye, bi taybetî bi şanoyê re mijûl bûye. Di heman demê de, çîrokên wî di kovara xwendekarên zanîngehê ya bi navê Rozayê de hatine weşandin.

Sala 2021ê, pirtûka wî ya yekemîn a bi navê Tazî derketiye pêşberî xwîneran. Di heman salê de, di Pêşbirka Helbest û Çîrokan a Huseyîn Çelebî de xelata duyemîn wergirtiye. Gelek çîrokên wî di sepana Dengêpirtûkan de hatine weşandin. Sala 2023yan, pirtûka wî ya duyemîn a bi navê Rêzan û Çolo ku ji çîrokan pêk tê, hatiye çapkirin. Bi romana TIRSê, Sozdar careke din îsbat kiriye ku ew yek ji nivîskarên ciwan ên kurdî ye ku bi ziman û ruhê xwe yê kurdewar, dikare berhemên bêhempa biafirîne.




# Lêgerîna nemiriyê ji Gilgamêş heta roja îro



Arslan Ozdemir

Mirovahî ji destpêka xwe ve vê pirsê dipirse: Ez kî me û çima ez dimirim? Ev pirs ne tenê pirsek hebûnê ye; ew di heman demê de lêgerînek gerdûnî ya mirovî ye ku di dilê çand, ol, felsefe û hunerê de ye.

Destana Gilgamêş şahida nivîskî ya herî kevn a vê lêgerînê ye. Rêwîtiya ku Gilgamêş, padîşahê Urukê, ji bo dîtina nemiriyê dest pê kir, di rastiyê de, sembola têkoşîna mirovahiyê ye ku hebûna xwe watedar bike.

Gilgamêş temsîla hêz, qewet û şahrezayiyê dike; lê gava ew bi mirina hevalê xwe Enkîdu re rû bi rû dimîne, ew fêm dike ku ew jî dê bimire. Ev têgihîştin wî dibe ber pirseke kûr: Ger ez rojekê bimirim, wê hingê ev hemû hêz, zanîn û serkeftin çi feyde bike?

Ev pirsyar di bingeha xwesteka mirovan a ji bo nemiriyê de ye. Di demên kevnar de, nemirî ji bo xwedayan dihat veqetandin; îro, mirov bi rêya teknolojiyê, zanistê, kariyer, navdariyê, an bandorên medyaya civakî li wê digerin.

Îro, têgiha nemiriyê formeke dîjîtal girtiye, ne biyolojîk. Mirov êdî naxwazin di forma xwe ya fizîkî de, lê bi nasnameyên xwe yên dîjîtal her û her bijîn. Profîlên medyaya civakî, wêneyên parvekirî û naveroka çêkirî bûne cureyên Tableta Gilgamêş a nûjen.

Di vê serdemê de, mirov nemiriyê di bîranîn û xuyabûnê de dibînin. Lêbelê, xala dawî ya ku Gilgamêş di rêwîtiya xwe ya destanî de gihîştiyê, nîşanî me dide ku nemirî ne di xuyabûnê de, lê di wateyê de ye.

Gilgamêş ji bo dîtina sirra nemiriyê zehmetiyên mezin dikişîne, deryayan derbas dike û bi xwedayan re diaxive; lê di dawiyê de, ew ne nemiriyê, lê şahrezayiyê dibîne.

Ji perspektîfeke sosyolojîk ve, mirovên îroyîn ji aliyê çandeke xerîdar ve tên kolekirin. Her tişt zû tê jiyîn û zû tê jibîrkirin. Têkilî, nirx, heta bîranîn jî dibin "tiştên xerckirinê".

Têgihîştina Gilgamêş ji bo vê serdemê bîranînek girîng e: "Tiştek her û her namîne, lê hin tişt xwedî wateyeke herheyî ne."

Îro roj, civak li gorî serkeftin û xuyabûnê nirx didin kesan. Lê Gilgamêş vê yekê ji me re dibêje: Nemiriya rastîn di wan kirinên baş, şahrezayî û nirxan de ye ku hûn ji bo mirovahiyê dihêlin.

Di vî warî de, destan neynikekê li hember pirsgirêka "têrnebûyîna" civaka nûjen nîşan dide.

Çiqas tiştên me hebin jî, heke em ji wateyê dûr bikevin, valahiya di hundirê me de mezin dibe.

Mayindebûna mirovan ne di avahiyan de, lê di şopan de ye.

Her çend Gilgamêş nemiriyê bi dest nexe jî, ew dîwarên Urukê ava dike. Ev dîwar sembola mayîndetiya wî ne. Ev rastiyek sosyolojîk nîşan dide: Divê mirovahî ne di laşê xwe yê fizîkî de, lê di berhemên ku ji bo civakê li pey xwe dihêle, li mayîndetiyê bigere.

Di cîhana îroyîn de, ev berhem dikare avahiyek, berhemeke hunerî, pirtûkek, an jî tenê kiryareke dilovanî be.

Civak berhevoka van şopên takekesî ye. Her takekesek şopek piçûk a wateyê dihêle ku di bîra kolektîf a mirovahiyê de dimîne.

***Çîroka Gilgamêş girêdana takekesî bi civakê re jî kûrtir dike, ji ber ku mirov ne tenê di hebûna xwe de, lê di têkiliya xwe ya bi civakê re jî wateyê dibînin.***

***Eger ev destana bi hezaran sal berê hîn jî bi me re diaxive, wate ew e ku Gilgamêş bi rastî jî nemirî dîtiye. Çîroka wî hîn jî tê vegotin, li ser tê fikirîn û nîqaşkirin.***

***Ev nîşan dide ku nemirî ne rewşek biyolojîk, mîrateyeke çandî ye.***

***Dersa herî mezin a ku Gilgamêş ji me re dihêle ev e: Jiyan ne ji bo bêdawîtiyê, lê ji bo wateyê tê jiyîn.***

***Hêza herî mezin a mirov ne di serketina li ser mirinê de, di qebûlkirina mirina xwe û hiştina şopên watedar di vê jiyana sînorkirî de ye.***

***Xwedîbûna vê hişmendiyê îro dibe ku mezintirîn şêweya şahrezayiya serdema nûjen be.***



# Guhertina 'habitus'ê

Mekanîka Darbeyê wek Habitusê, rewşa herî kûr a nexweşiya civaka kurd e, ku ji aliyê sîstema înkar û îmhayê ve hatiye çêkirin. Lê belê, têkoşîna azadiya gelê kurd bi fikrên Rêber Abdullah Ocalan re di gelê kurd de vejîna ruhî û sosyolojîk ava kir. Ev yek di kurdan de têgiha habîtusê dide guhertin û rêya Jiyana Azad vedike



Xweşkanî
Felemez Ulug

Heyeta Îmraliyê beriya civîna komîsyona meclisê, 2yê kanûna 2025an, bi Rêber Apo re hevdîtinek pêk anî. Heyetê der barê hevdîtinê de daxuyaniyek da. Hat gotin ku Rêber Abdullah Ocalan der barê gotin û tevgerên dij-pêvajoyê de nerînên xwe bi heyetê re par ve kirine.

Di nirxandinan xwee de nêrîn û nêzîkatiyên li dijî pêvajoya çareseriyê û hewldanên berê yên bi heman rengî berê bi bîr xistin. Li ser vê rewşa ku di hemû pêvajoyan de rû dide, wekî têgiha 'habitus'ê pênase kir û bal kişand ser mekanîka darbeyê. Diyar kir ku divê ev wekî xebateke darbeyê ya klasîk neyê dîtin, wek pêngaveke li dijî her gavên ji bo bipêşxistina pêvajoyê û hewldanên afirandina nêvengeke tehlûke bê fêmkirin.

'Mekanîka Darbeyê wek Habitusê' çi ye ku di vê pêvajoyê de Rêber Abdullah Ocalan bahsa wê dike. Divê em pêşî li ser vê têgihê rawestin.

Habitus, têgihek e ku hem cîhana civakî diafirîne û hem jî ji aliyê wê ve tê afirandin; bi gotineke din, di nav xwe de diyalektîkek du-alî dihewîne.

Têgiha habitusê, ku cara yekemîn di berhemên Aristoteles de hatiye dîtin, di serdema modern de ji aliyê Marcel Mauss ve ji bo zanistên civakî hatiye veguhastin û ji aliyê Maurice Merleau-Ponty ve di felsefeya wî de hatiye bikaranîn.

Habitus, ku yek ji têgihên bingehîn ên sosyolojiya Bourdieu ye, tê wateya civakîbûna ku aktorên civakî wekî şêwazên têgihiştin, hîskirin, fikirîn û tevgerînê di hundirê xwe de bi cih dikin.

Mekanîka Darbeyê wek Habitusê, rewşa herî kûr a nexweşiya civaka kurd e, ku ji aliyê sîstema înkar û îmhayê ve hatiye çêkirin. Lê belê, têkoşîna azadiya gelê kurd bi fikrên Rêber Abdullah Ocalan re di gelê kurd de vejîna ruhî û sosyolojîk ava kir. Ev yek di kurdan de têgiha habitusê dide guhertin û rêya Jiyana Azad vedike.

Berî her tiştî, pêwîst e em têgihan hêsan bikin. Mekanîka Darbeyê wek



Habitusê ku Rêber Apo di peyama xwe de bahsa wê dike çi ye? Ev ne têgiheke standard e ku di qadên zanistên civakî de, bi taybetî di xebatên li ser habitusê yên Pierre Bourdieu de, bi awayekî berbelav tê bikaranîn.

Lê belê, heke ev têgih wekî wergerek an têgihek nû were bikaranîn, em dikarin wateya wê li ser bingeha beşên cuda jî analîz bikin.

Habitus sîstemek ji meyl, gihiştin û tevgereke domdar e ku di encama ezmûnên civakî yên kesekî de çêdibe. Ew wekî bernameyeke hundirîn tevdigere ku çawa kesek di cîhana civakî de tevdigere, difikire û hîs dike. Ew di heman demê de encama avahiya civakî ye û ango li gorî wê şekil digire.

Bi wateya fizîkî, ew tê wateya hêzeke ji nişka ve û şiddeta li dijî tiştekî. Ev têkildarî makîneyan, hêzan û tevgerên fizîkî yên ku li gorî qaîdeyên zanistî ne. Ew gelek caran tê wateya tiştekî ku bi awayekî otomatîk an nebizanebûn diqewime.

Bi kurtî, habitus pergala bêhiş a ''çawa bijîn û tevbigerin'' e ku civakê di laş û hişê me de bi cih kiriye û em jî wê pergalê bi awayekî xweristî didomînin.

Li aliyê din, habitus ew hîsa hundirîn e ku dinihêre û têdigihîje, hîs dike û hest dike, difikire, tevdigere û pêk tîne û pênase bike. Ev hîs ne tenê di hiş de ne, di laş de jî bi cih bûne lewma refleks jî li gorî wê bi pêş dikevin.

Mirov bi piranî nizane ku habitusa wî/ê çi dike, lê di her kêliyê de ew biryardar e. Mîna "hîsa lîstikê" ye, di fitbola kolanan de tu qeydeyan nabînî, lê herkes dizane çi bike.

Dema zarokiyê bi awayekî hûr û kûr tê avakirin, paşê bi zehmet tê guhertin. Lê di cihên nû de (kar, dibistan, heval) jî xwe nîşan dide.

Habitusa karkeran, habitusa dewlemendan, habitusa gundiyan ji hev cuda ne. Yanî li gorî malbat, çîn û civakê şekil digire. Ev cudatî ne tenê di hiş de, di laş de jî xuya dibe. Bourdieu dibêje: ''Ne tenê civak mirov diyar dike, ne jî mirov bi temamî azad e. Habitus nîşan dide ku herdu jî bi hev re ne.''

Habitus ji bo Rêber Abdullah Ocalan ne tenê gotineke zanistî ye, ew di çarçoveya civakî û çînî de jî bi berfirehî li ser disekine û dinirxîne.

Di vê çarçoveye de, tişta ku mirov ji gotina Rêber Ocalan derbixe ew e ku kesên li dijî pêvajoya çareseriyê bi têgiha habitusê dikarin bên pênasikirin. Ev bingeha xwe ne tenê ji dijberiya gelê kurd digire, her wiha ev nîşan dide ku di kodên civakê de ev refleksên habitusî zindî û xurt in û niha weke mekanîka darbeyê dixebitin.



Hisên Çatikkaş

# Pêvajo, dagirker û zimanê dagirkeran

Rojeva siyasî ya li Rojhilata Navîn germ e. Jixwe tişta tê dîtin jî ew wê stratejiyên sedsala pêşiya me li gorî vê rojeva germ bên diyarkirin. Lewra her hêz û rêxistinên li vê herêmê ji bo destên xwe xurt bikin bi hemleyên nû xwe tevlî vê rojeva germ dikin. Di serî de hêzên wekî Amerîka û Îsraîlê her wiha dewletên wekî Tirkiye, rejîma nû ya Sûriyeyê û welatên bendavê bi hemleyên xwe dixwazin bibin xwedî rol û mîsyon. Bêguman kurd û rêxistinên kurdan jî di nav hewldanên mezin de ne ku bêstatûbûna kurdan ji holê rabe û weke sedsala borî careke din kurd nemînin bêstatû. Lê belê dewletên wekî Tirkiye û Sûriyeyê hemleyên xwe li dijî kurdan dikin. Her gava rayedarên van dewletan diavêjin ji bo bêhêzkirina kurd û rêxistinên kurdan e. Di esasê xwe de, ev dewlet di bêstatûbûna kurdan de israr dikin. Lewra gelek tawîzan didin hêzên navneteweyî. Ji ber vê yekê ye ku bi taybetî wezîrê karê derve yê Tirkiyeyê wekî mozan li her derê qaşo dîplomasiyê dike, li dijî kurdan lobiyan ava dike û bi rêya vê dîplomasiyê gefan li rêxistinên kurdan dixwe. Taybetî jî Tevgera Azadiya Kurdistanê, li Kurdistanê wekî "dagirker" bi nav dike û vê yekê piştî her civîna xwe bi lêv dike. Vêca pirsa girîng ev e ku "kî li Kurdistanê dagirker e?"

Bêguman bersiva vê pirsê zelal e, lê belê mirov dikare careke din zelaltir bike. Ji devera kurd lê dijîn re Kurdistan tê gotin ku ev rastî û heqîqet e. Kesên bi darê zorê ango bi çek, tang û balafiran û her wiha bi qetlîam û qirkirinan li Kurdistanê ne, dewletên Tirkiye, Sûriye, Îran û Iraqê ne. Ango ev dewlet li Kurdistanê ne rewa ne, kesên li ser axekê ne rewa bêguman dagirker in. Van dewletan sedsal berê bi alîkariya hevkarên xwe welatê kurdan di nav xwe de parçe kirin û kurd bêstatû hiştin. Heman tiştê dixwazin ji bo sedsala pêşiya me jî bikin, lewra çi tê ber devê rayedarên van dewletan dibêjin û ji bo deskeftiyên kurdan tune bikin jî ji tiştekî texsîr nakin. Pêşengiya van jî rayedarên dewleta tirk dikin; geh baz didin Bexdayê, geh diçin Şamê û geh jî diçin ber lingên Trump û ji Trump rewabûnê dixwazin. Ev hêzên li ser axa Kurdistanê ne rewa ne, rewabûna xwe li derve ber lingên hêzên navneteweyî digerin. Ji bo vê jî bi her awayî piştgirî û hevkariya hev dikin. Bi taybetî jî Tirkiye û rejîma bermahiyên DAIŞê li ser bêstatûbûna kurdan li hev dikin. Ji ber ku bêyî hev ti gavan navêjin û jixwe heke rojeva germ a Rojhilata Navîn û têkoşîna gelê kurd destûr bidaya van her du rejîman, wê ji zû de li dijî deskeftiyên kurdan êrişên tunekirinê pêk bianiyana.

Divê êdî dewletên dagirker fêm bikin ku hemû polîtîkayên wan ên bişaftin, qirkirin û tunekirinê li Kurdistanê têk çûn ango hemû polîtîkayên wan rastî benda têkoşîn û berxwedana gelê kurd hatin. Lewra ya baş ji bo wan ev e ku bi rastî û heqîqata kurdan re rûbirû bibin. Di nav vê rojeva germ de wê nikaribin careke din kurdan bêstatû bihêlin. Tevî hemû tawîzên didin hêzên navneteweyî jî wê bi ser nekevin. Ew jî vê yekê baş dizanin ku bi Tevgera Azadiya Kurdistanê re pêvajoya aştiyê didin meşandin. Wekî alternatîf vê pêvajoyê di destên xwe de digirin. Heta ji wan tê, pêvajoyê direj dikin û gavan navêjin. Sedema gavneavêtina wan bêguman li qulpan digerin ku dagirkeriya xwe bidomînin. Helbet ev ji hêla kurdan ve ne hêsan e. Lê belê êdî kurd dikarin li aliyekî pêvajoya aşitiyê/mûzekereyan bimeşînin, li aliyê din jî li hemberî dek û dolabên dagirkeran baldar û hişyar bin.

Rayedarên dewleta tirk tevî rewş/pêvajoya çareseriyê jî gefên xwe li ser kurdan kêm nakin. Ango hê jî kurd û Kurdistan di bin êriş û gefên rayedarên tirk de ne. Bêguman ev zimanê êrişkar ti sûdê nade pêvajo û rewşa heyî. Lê em dizanin ku derdê wan ne pêvajo ye ku bidomînin. Li kêleka vê pêvajoyê bi dehan plan û proje danîne pêşiya xwe. Ji bo van plan û projeyên xwe pêk bînin jî vê pêvajoyê jî wekî amûreke kêrhatî bi kar tînin.


Birêz Ocalan û Tevgera Azadiyê ji gelek hêlan ve bi taybetî jî bi gavên şênber plan û projeyên wan pûç kirin. Lewra êdî ne rayedarên dewletê her wiha muxalefetê, rojnamegerên qaşo demokrat û heta mirovên kolanê li dijî civaka kurd zimanekî qirêj bi kar tînin û dibêjin kurdan "hedê xwe bizanibin''. Derûniya wan serobin bûye û çi tê ber devê wan divereşin. Li ser meselê Ozgur Ozel kurdan bi 'Sendroma Stockholmê' sucdar dike. Celadbûna xwe tîne bîra kurdan. Bêguman em kurd dizanin ku hûn û pergala we bi tevahî kujerên kurdan in. We û pergala we bi sedhazaran kurd qetil kirine û yek ji we jî di vê mijarê de ne paqij e. Lewra êdî dilê kurdan ji gotinên we yên beredayî dixele. Bela xwe ji van gotinên beredayî berdin. Êdî hûn û hemû dinya jî dizanin ku kurd ne kurdên berê ne ku guh bidin van gotinên we yên tirsandinê, bêzarkar û dilxelok. Êdî rastî şilfitazî li holê ye û em kurd celadên xwe baş nas dikin. Ji ber vê jî divê rayedarên dewleta tirk pêşî zimanê xwe biguherînin û her wiha zimanekî çêker li ser xwe û çapemeniya xwe ferz bikin. Ango divê ew wêrektiya xwe nîşan bidin û hebûna kurdan û statûya Kurdistanê qebûl bikin. Êdî divê fêm bikin ku kurd bi dek û dolaban nayên xapandin. Çawa li xwe mikûr tên û bi celadbûnê hev sucdar dikin, divê fêm bikin ku tirk ne efendiyê kurdan û kurd jî ne xulamê dewleta wan in.

Bi kurt û kurmancî, êdî em kurd bi dengekî zelal, aşkere û bilind dibêjin ku em kurd in, welatê me heye û navê welatê me Kurdistan e. Em êdî bêstatûbûnê û bênasnametiyê qebûl nakin. Lewra divê hemû dagirker ku rêxistinên kurdan li ser xaka Kurdistanê wekî dagirker bi nav dikin, kurdan wekî kurd bi nav bikin û statûya kurdan qebûl bikin. An jî wê rastî û heqîqata kurd û Kurdistanê her tim li ser pişta wan bar be. Wê kurd û Kurdistan bibin bela serê wan heta azadiyê. Êdî divê dagirker fêm bikin ku leşker, tang, top, karmend û her çi yê wan li ser xaka Kurdistanê heye, li welatê me dagirker in û cihê wan li welatê me nemaye. Em ji we re bi aşkere dibêjin ku an hûn ê li ser maseyê statûya kurd û Kurdistanê qebûl bikin, an jî bi rêya têkoşîn û berxwedanê em ê her tim bela serê we bin. Êdî hûn kîjanê tercîh bikin, em amade ne.



# Lûtkeya hilkişînê nîşaneya daketinê ye

Dewleta ku hilweşîna xwe û bilindbûna kurdan dibîne, li ber xwe dide, hewl dide xwe ji vê têkçûnê û kurdan jî ji serkeftinê dûr bigire. Ji bo wê rabûn, çûn Îmraliyê û hawara xwe birin wir. Xwestin wan ji têkçûnê bifilitîne. Lê dermanê tirsê û têkçûnê tune ye



Hesen Huseyîn Denîz



Di dîrokê de gelek hêz hene, ku destpêkê bûne dewlet an serwer, piştre gihîştine asta împaratoriyê û hikum li ser erdekî mezin ê cîhanê kirine û piştre ji ber hin sedemên navxweyî yan derveyî ji lûtkeyê daketine û ber bi tunebûnê ve çûne. Roj hatiye ew hêza li cîhanê hikum dikir, bi lêdaneke hêzeke nû, têk çûye û ji dîrokê rabûye. Gava em li dîrokê binêrin, em dikarin wisa hinek mînakan bidin û ber bi roja me ve werin:

Berî zayînê bi sê hezar salan (Bz.2334-2154) li ser axa Mezopotamyaya jêrîn dewleta **Akad** a gihîşt asta împaratoriyê hebû. Vê împaratoriyê 180 salan hikum kir, dawî ji ber serhildanên navxweyî bi êrişa Gûtiyan têk çû.

***Împaratoriya Babîl*** (Bz.626-539), 87 salan li ser van axan hikum kir, ji aliyê persan ve ku artêşa wan bi piranî ji medan pêk dihat, hat hilweşandin.

***Împaratoriya Persan a Ahamenîş*** (Bz.550-330), 220 salan li ser axa med û persan hikum kir, lê dawî bi êrîşa Îskender hat hilweşandin.

***Împaratoriya Makedonyayê*** (Bz.808-108), 640 salan hikum kir, dawî ji aliyê hikumdariya Roma ve hat daqurtandin.

***Împaratoriya Romayê*** (Bz. 753-476 Roma Rojava), 277 salan hikum kir, Romaya Rojava hilweşiya, lê ya Rojhilat domiya.

***Mînakên piştî zayînê;***

Împaratoriya Çînê (Bz. 202- Pz.220), 442 salan hikum dike, lê ji ber şerên navxweyî têk diçe.

***Împaratoriya Romaya Rojhilat*** (Bîzans) (330-1453), 1123 salan hikum dike, ji aliyê dewleta Osmanî ve tê têkbirin.

***Împaratoriya Sasaniyan (***224-651), 427 salan hikum kir bi fethên ereban dawî lê hat.

***Dewleta Ebasiyan,*** (750-1258), 508 salan hikum kir, di encama êrîşên Mogolan de têk çû.

***Împaratoriya Selçûkiyan***, (1037 – 1194) 157 salan hikim kir, bi parçebûnê dawî li xwe anî.

***Împaratoriya Mogolan*** (1206 – 1368), 162 salan hikum kir, paşê parçe bû û dawî lê hat.

***Dewleta Osmaniyan*** (1299 – 1922), 629 salan hikum kir, piştî şerê cîhanê yê yekemîn hilweşiya.

***Împaratoriya Safawiyan*** (1501 – 1736), 235 salan hikum kir, bi hilkişîna Afşariyan re dawî lê hat.

***Împaratoriya Rûs*** (1547 – 1917), 370 salan hikum kir, bi şoreşa Lenîn têk çû.

***Împaratoriya Avusturya-Macaristanê*** (1804- 1918), 114 salan hikum kir, lê di encama şerê cîhanê yê yekemîn de hilweşiya.

Em dibînin ku piraniya van împaratoriyan li ser axa kurdan an li derdora axa kurdan jiyane. Yanî Mezopotamya her dem bûye qada bilindbûn û daketina împaratoriyan. Piraniya van împaratoriyan ji asta dewleteke biçûk dest pê kiriye, piştre hêz girtine û berfireh bûne, gihîştine lûtkeya mezinbûna xwe û roj bi roj ber bi jêr ve daketine heta rojekê bi derbekê hilweşiyane û bi piranî yan li holê nemane, yan li şûna wan hêzên din bûne şiyandar.

Piştî şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn jî bi rêya parçekirin an parkirina cîhanê ya di navbera hêzên sermayedar de, gelek dewletên biçûk an nîvmezin hatin avakirin. Dewletên sermayedar û desthilatdar ji bo xwe vekişînin ser erdnîgariya xwe û li şûna erdên jê vekişiyane dewletên lawaz û bi xwe ve girêdayî çêbikin, rastkêş girtin destê xwe û li ser nexşeyê welat par ve kirin. Ji van mînakan a herî balkêş Afrîqa ye. Dewletên wek Lîbya, Cezayîr, Çad, Nîjer, Misir, Sûdan, Botswana, Namîbya, Afrîqaya Navîn, Bûrkîna Faso û li Rojhilata Navîn dewletên wek Urdun, Iraq, Erebistana Siûdî, Kuwêt, Sûriye û Tirkiye bi destê îngilîz û fransiyan hatin xêzkirin. Di encama vê xêzkirinê de gelek miletên din hatin mexdûrkirin, ku kurd yek ji van miletan in.

Di encama vê parvekirinê de dewleta îngilîz ku li başûrê Kurdistanê û dewleta fransî ku li rojavayê Kurdistanê desthilatdar bûn, vekişiyan û cihê xwe ji partiya Baas a bi serweriya ereban re hişt. Di ser vê parvekirinê re 80 sal, di ser damezirandina komara Tirkiyeyê re 100 sal, di ser parçebûna Kurdistanê ya di navbera Pers û Osmaniyan de, 1386 sal derbas bûn. Van dewletan dîrokeke mezin dûvdirêj a bi êş û jan bi kurdan dan jiyandin, lê îroj kurd di warê zanist, rêxistinî, exlaq û bîrûbaweriyê de û bi çand, ziman, dîrok, huner û kevneşopiyên xwe yên rehên xwe berdane kûrahiya dîrokê li pêş desthilatdarên xwe ketine û dewletên desthilatdar di nav pirsgirêkên navxweyî û paşverûtiyê de ketine pêvajoya sernişûvçûnê û roj bi roj diherifin, dihelin û hildiweşin.

Ji van dewletan, dewleta Îranê bi zordariya olî, bi darvekirin, tirs, saloxdarî, zîndanîkirin û dûrgirtina mirovên xwe ji pêşketinên cîhanê, dixwaze temenê xwe dirêjtir bike, wek dareke kevnare ya ji hundir ve agir pê ketibe, êdî xelasiya wê ya ji vê têkçûnê tune ye, pêvajo herçendî dirêj bibe jî hilweşîn nêz û vebir e.

Dewleta Iraqê jixwe ev çend sal in hilweşiyaye û tenê bi alîkariya dewletên cînar û sermayedar li ser piyan tê hiştin. Di encama vê lawazbûnê de, kurdan xweserî bi dest xist û dikarîbûn serxwebûn jî bi dest bixistana, lê ji sedemên navxweyî yên kurdan û êrîşên dewletên desthilatdar ev yek pêk nehat, lê her gav dikare pêk were.

Sûriye jixwe têk çû û hîn ber bi ku ve biçe ne diyar e. DYA hewl dide û dixwaze bi kotekî vê dewletê li ser lingan bigire, her wiha armanca Tirkiyeyê jî girtina li ser lingan a dewleta Sûriyeyê ye, ku tirs û gumana wan tev avabûna dewleteke kurdî ye. Ji bo ev yek pêk neyê, teroristê xelat danîbûn jêkirina serê wî, bi cilûberg û kravat vexwendin qesra xwe, lê dikin û nakin, nikarin Sûriyeyê ji têkçûnê û hêzên kurdî jî ji bilindbûnê bi paş ve bixin.

Bêguman xala girîng li Rojhilata Navîn dewleta Tirkiyeyê ye ku ew ketiye pêvajoya hilweşînê. Dewleta ku hilweşîna xwe û bilindbûna kurdan dibîne, li ber xwe dide û hewl dide xwe ji vê têkçûnê, kurdan jî ji serkeftinê dûr bigire. Ji bo wê rabûn, çûn ber lingên Îmraliyê û hawara xwe birin wir da ku riyekê li ber wan veke û wan ji têkçûnê bifilitîne, lê mixabin ne dermanê tirsê heye û ne jî yê têkçûnê.

Li jor me dîroka bilindbûn û têkçûna împaratoriyan rêz kir. Tirk jî wê ji vê qederê rizqê xwe bistînin. Dewleta îngilîz ew damezirand, destek dayê, xurt kir, bilind kir, anî lûtkeyê û êdî bi destpêkirina sedsala duyemîn a vê komara çêker re, daketina ji lûtkeyê dest pê kir. Roj bi roj em dibin şahidê têkçûna dewleta tirk a ji aliyê exlaqî, civakî, siyasî û aborî ve û vê yekê ev dewleta xwînxwar xistiye nav hilweşîneke xurt, ku li şûna wê hêza kurdî ya birêkûpêk, xwedîexlaq, civak û siyaset serî dide der û derdikeve ser ruyê erdê, dest bi şanîdana hebûn û jîna xwe dike.

Niha dem dema kurdan, serdema kurdî û çaxa Kurdistanê ye. Ti hêz êdî nikare pêşî li ber bilindbûna kurdan bigire. Rojava gav bi gav azad dibe, gav bi gav dest dide Başûr û her du bi hev re mezin dibin. Ev mezinbûn dest dide Rojhilat û rejîma dardeker û paşverû roj bi roj têk diçe, diherife û dewleta tirk li ber lingên vê pêşveçûnê çem û çem diçe.

Ev yek ji dîroka bi hezarê salan diyar e û zû ne dereng kurd wê bigihîjin azadiya xwe ya heqkirî. Ev sedsal gav bi gav dibe sedsala kurdan.



Kurdistan Lezgiyeva

# Ji çiyayên Qefqasyayê heta Kapîtolê

Ji bilî xwepêşandanên bêdawî yên li Gurcistanê, partiya Xewna Gurcistanê ya desthilatdar bi berdewamî çîrokeke siyasî û aborî li dora ramana veguherandina welêt bo navenda lojîstîk a sereke ya başûrê Qefqasyayê ava dike. Ev stratejiya balkêş, destpêşxeriyên binesaziyê, hevkariya navneteweyî û seferberiya siyasî ya navxweyî bi hev re dike yek û rasterast bandorê li encamên hilbijartinên parlamentoyê dike.

Zêdebûna beşdariya Çînê di sektora veguhastin û lojîstîkê ya başûrê Qefqasyayê de eleqeya Amerîkayê ya ji bo Gurcistanê zêde kiriye. Siyaseta Amerîkayê ya Tiflîsê niha li ser sê nêzîkatiyên temamker ava bûye:

***1. Piştgiriya aborî ji bo binesaziyê û dîjîtalîzekirina lojîstîkê***

Ajansa Pêşketina Navneteweyî ya Dewletên Yekbûyî (USAID), sibata 2024an, ji bo piştgiriya Bernameya Veguhastin û Lojîstîka Kesk a USAIDê peyamek da. Armanca bernameyê dîjîtalîzekirina lojîstîkê û kêmkirina şopa karbonê ya sektora veguhastinê li Gurcistanê û her wiha kêmkirina girêdayîbûna bi korîdorên veguhastinê yên Rûsyayê li herêmê bû.


Ji ber tasfiyekirina USAIDê, projeya Veguhastin û Lojîstîka Kesk bi fermî berî dema xwe (11ê sibata 2025an) hat bidawîkirin. Di dema temambûna bernameyê de, ji 24.4 milyon dolarên ku di bin peymanê de hatine veqetandin, bi qasî 14.6 milyon dolar hatibûn bikaranîn. Lê belê, ji ber bidawîbûna zû ya projeyê, fonên mayî nehatin bikaranîn û pêşveçûna zêdetir a înîsiyatîfê di bin vê peymanê de nehatiye plankirin.

***2. Mobîlkirina çavkaniyên taybet bi rêya destpêşxeriyên veberhênana binesaziyê***

Gurcistan bi rêya Hevkariya ji bo Binesaziya Cîhanî û Veberhênanê (PGII) beşdarî destpêşxeriyên binesaziyê yên Rojava dibe, ku projeyek G7 û Dewletên Yekbûyî ye û armanc dike ku sermayeya taybet û giştî wekî alternatîfek ji bo destpêşxeriyên çînî bikişîne. Sala 2024an, rêveberiya Biden ragihand ku PGII armanc dike ku fonên girîng kom bike- armanca gerdûnî bi sedan milyar dolar e heta sala 2027an. Ji bo Gurcistanê, ev yek îhtîmala hev-fînansekirina projeyên mezin ên veguhastin û kesk di salên pêş de vedike. Pêkanîna zêdetir niha bi polîtîkayên rêveberiya Trump ve girêdayî ye.

***3. Piştgiriya leşkerî û parastinê***

Di bin bernameyên ewlehiyê de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi rêkûpêk ji bo perwerdehiya leşkerî, kirîna alavan û projeyan ji bo misogerkirina hevsengiya bi hêzên NATOyê re (di nav de Fînansa Leşkerî ya Biyanî (FMF) û amûrên din) fonan dide Gurcistanê. Di hin salan de, pakêtên alîkariya ewlehî û parastinê yên tevahî li seranserê kategoriyên cuda gihîştine deh milyon dolaran. Bi gelemperî di navbera 30-40 milyon dolaran de bi rêya FMF û bernameyên têkildar hene.



Lê, tîrmeh-tebaxa 2024an, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê biryar da ku hin ji alîkariya xwe ya ji bo Gurcistanê demkî rawestîne. Li gorî raporên medyayê û çavkaniyên fermî, ev bi qasî 95 milyon dolarî bû. Sedema ku hat destnîşankirin, destpêşxeriyên qanûnî yên Tiflîsê bûn, ku Washington wekî "derketin ji pîvanên demokratîk" dît (mînak, qanûna "ajanên biyanî"). Ev gav xwezaya şertî û alîgiriya siyasî ya alîkariya amerîkî nîşan dide.

Tevî mîqdara girîng a alîkariyê ya mayî jî, belavkirina wê ya rastîn ji hêla siyaseta navxweyî û biryarên ajansên hikûmeta amerîkî ve tê destnîşankirin.

Stratejiya Xewna Gurcistanê ji lojîstîka veguhastinê wêdetir diçe û projeyek demdirêj temsîl dike ji bo veguherîna welêt bo navendeke jeo-aborî, ku her rê an tuneleke trênê ya nû dibe hêmanek ji paytexta siyasî ya Xewna Gurcistanê. Hilbijartinên ku pêk hatin dê diyar bikin ka civaka Gurcistanê van projeyan wekî misyonek neteweyî û îsbatek bandora partiya desthilatdar qebûl dike, an jî rexneyên muxalefetê yên li ser girêdayîbûna zêde ya bi hevkarên derve re dê serdest bibin.



Ahmet Aktaş

# Hatina Mesûd Barzanî ya Cizîrê

Li ser vexwendinê, Mesûd Barzanî, 29ê mijdarê, derbasî Cizîra Botan bû û li vê derê beşdarî Konferansa Melayê Cizîrî ya Navneteweyî ya 5emîn bû. Ev konferans, ji aliyê Parêzgeriya Şernexê, Zanîngeha Şernexê û Qeymeqamiya Cizîrê ve hatibû amadekirin û van saziyan bi fermî Mesûd Barzanî vexwendibû.

Her wiha Cîgirê Wezîrê Karên Hundir Munîr Karaloglu, berdevka Dem Partiyê Ayşegul Dogan, parlamenterê AKPê Arslan Tatar û parlamenterê HUDAPARê Şehzade Demîr jî, hem pêşwaziya Barzanî kir, hem jî li gel wî beşdarî konferansê bûn.

Hem hatina wî ya vê herêmê û vî bajarî, hem şêwaza hatin û pêşwaziya wî gelek ket rojevê û gelek guftûgoyên erênî û neyînî li ser hatin kirin. Ji aliyê kurdan ve, hatin û gera wî ya vê herêmê û bi tevahî hatina wî ya Kurdistanê, bi piranî erênî hat dîtin û pêşwazîkirin.

Lê ji aliyê hinek partî û kesên nijadperest ên tirk ve neyînî hat dîtin û hinek helwestên neyartî û nemirovî ji aliyên hinek erkdarên dewleta tirk ve hatin nîşandin û heta hinek gef jî hatin xwarin. Van aliyên dijber, ger û hatina wî şibandin Koma Aştiyê ya 34 kesan ku sala 2009an ji deriyê Xabûrê derbasî Bakur bûbû, gotinên tund ên dijminane bi kar anîn.

Ev jî tê wê wateyê ku ev kes û alî çawa ku dijberên pêvajoya yekê bûn, dijberê vê pêvajoya duduyan in jî.

Her wiha Mesûd Barzanî, di axaftina xwe ya Sempozyûma Melayê Cizîrî de, peyamek erênî ji bo pêşvebirina vê pêvajoyê nîşan da û spasiyên xwe ji bo gavên wî yên erênî û hêja, ji Rêber Apo re pêşkêş kirin. Wî got: ''Ez li vira aşkere radigihînim ku em jî, bi hemû hêza xwe destekê didin vê pêvajoyê û çi ji me bê xwestin û ji destê me çi were, em amade ne ji bo pêvajoyê pêk bînin.''



**Hem hatina wî ya vê herêmê û vî bajarî, hem şêwaza hatin û pêşwaziya wî gelek ket rojevê û gelek guftûgoyên erênî û neyînî li ser hatin kirin. Ji aliyê kurdan ve, hatin û gera wî ya vê herêmê û bi tevahî hatina wî ya Kurdistanê, bi piranî erênî hat dîtin û pêşwazîkirin**

Li beramberî vê helwesta erênî, hinek erkdarên dewletê, weke midûrê ewlekariya Cizîrê, şaredarî nekiriye hevpara vê konferansê û nehişt ku hevşaredarên Cizîrê derbasî salona konferansa otêlê jî bibin û di ser de jî gef li wan xwarin.

Parlamenterên DEM Partiyê yên vî bajarî jî, roja duduyan di dawiyê de hatin vexwendin!

Em bînin bîra xwe, Rêber Apo demek berê nameyek ji Mesûd Barzanî re şandibû, da ku ew çalaktir be ji bo yekîtiya neteweyî û piştgiriya pêvajoyê çareseriyê.

Di van rojên dawî de, tevgereke berbiçav haye ji bo yekrêziya kurdî; li aliyekî şandeyên DEM Partiyê li gel hêzên Başûr û Rojava civiyan, li aliyekî germbûna têkiliyen navbera Rojava û Başûr û her wiha çûna Dihoka Başûr a Mazlûm Ebdî û Îlham Ehmed ji bo beşdariya li Foruma Aştî û Ewlehiyê ya Rojhilata Navîn a 6emîn.

Li aliyê din, hilbijartin li Iraqê pêk hat û her çend ne li gor dilê wan be jî, DYA wê rêveberiyek ji ya berê xurttir av bike da ku dikaribin bi wan re baştir bixebitin. DYAyê, 3yê vê kanûnê, li Hewlêrê bi resepsiyoneke balkêş konsolxneya xwe vekir ku ew li cîhanê ya herî mezin e.

Tê gotin ku wê di van rojên nêzîk de Mark Savaya Nûnerê Karên Taybet ê Iraqê yê Trump, biçe Bexdayê û li gorî daxuyaniyên wan 'wê li Iraqê guhertinên girîng û balkêş pêk bên'.

Bêguman di nav dewleta tirk de, bi gotina Rêber Apo hinek kes an aliyên derveyî norm-dewletê hene û li dijî pêvajoyê dixebitin, astengan derdixin, provakasyonan dikin. Helbet, van alî û kesan, ji van pêşketinên erênî yên navbera hêzên kurdistanî, têkiliyên navbera Başûr û Rojava (yên nêzî felsefeya Rêber Apo) gelek aciz in û wê hewl bidin ku van têkiliyan erênî têk bibin.

Weke ku tê xuyakirin, DYA dixwaze bi lez û bez dest bavêje kar û barên Iraqê. Jixwe di van rojên dawî de, êrişên dijwar hatin ser qada xazê ya Kormorê û ji bo van êrişan hêzên Heşdî Şebî û bi gelemperî Îran tên tawanbarkirin.

Li gel vê, Trump berê êrişên daye gelek dewletan, wek Venezuelaya bi rêveberiya Madûro, lê diyar e ku nîşaneyên xurtkirina êrişên li ser Îranê zêdetir in.

Helbet ji ber ku li herêmê hêza diyarker a herî li pêş e, divê rêveberiyên hêzên Kurdistanê van pêşhate û siyasetên hegemon baştir bibînin, bizanibin, berfirehtir bişopînin û li gorî wê jî amadekariyên xwe bikin, da ku ji nişka ve, jî xafil ve neyên girtin!



Siyabend Aslan

# Trawmaya civakî, veguhestina navnifşî û rêyên başbûnê

Trawmaya civakî, ji birîneke derûnî ya takekesî wêdetir, pêvajoyeke kûr e ku binyada civakî û çandî ya civakekê serûbino dike, baweriyê parçe dike û bandorên wê bi nifşan didomin. Berovajî karesatên xwezayî, ev trawma bi destê mirovan, bi zanebûn û sîstematîk tên kirin. Rûdanên wekî şer, koçberiya bi darê zorê, zextên sîstematîk û komkujî ji bilî zerarên fîzîkî hesta mexdûran a baweriya bi edaletê, mirovahiyê û dahatûyê jî têk dibe. Ev cure rûdan, encama mudaxeleyên wisa ne ku armanc dikin rabirdû û dahatûya civakekê bixin bin serdestiya xwe û li ser mexdûran şopan dihêlin ku jêbirina wan zehmet e.

**Veguhastina navnifşî**

Taybetmendiya herî girîng a trawmaya civakî ew e ku derbasî nifşên paşê jî dibe ku ew rûdan neditîne. Di lîteraturê de ji vê rewşê re "trawmaya navnifşî" tê gotin. Trawma, bandorê tenê li kesên ku ew kêlî jiyane nake, derbasî zarok û neviyan jî dibe.

Di vê veguhastinê de ragihandina navmalbatî diyarker e. Dêûbav tirs û bêçaretiya xwe devkî îfade nekin jî, ev hest di atmosfera malê û reftaran de cih digirin. Dêûbav ji bo parastina zarokan bêdeng dimînin lê zarok vê bêdengî, tengezarî û xemgîniyê mîna sûngerekê dimijin. Zarok giraniya tiştên nayên gotin hîs dikin û dinyayê wekî cihekî neewle dibînin. Helwestên dêûbavan yên wekî parastina zêde, hêrs an matbûn bandoreke neyînî li derûniya zarokan dike û dibe sedem ku ew jî trawmayê bijîn.

**Barê bêdengiyê**

Çîroka malbatekê ku rûdanên li Dêrsim ên sala 1938an dîtiye mînakeke balkêş e. Di lêkolînekê de hatiye dîtin ku bavekî ku di zarokatiya xwe de şahidî li rûdanan kiriye û malbata xwe winda kiriye, trawmaya xwe bi "bêdengbûnê" hilgirtiye û jiyaye. Vî kesî, dehşeta ku jiyaye nekarîbûye îfade bike, lê bi reftarên xwe daye der; bo mînak, ji bo ku ji hesta gemarîbûnê xelas bibe zivistanê jî her roj xwe şûştiye. Dozdeh salan av venexwariye û tenê çay û cixare vexwariye.

Kurê vî bavî (nifşê duyem), tevî ku tiştên bavê wî jiyayî neditîne jî, ew êş û keder û şîn wergirtiye. Gelî û çiyayên erdnîgariya ku rûdan lê qewimîne, ji bo wî ne tenê parçeyekî xwezayê, "cihûwarên germ" in, yanî mekanên hafizeyê ne ku trawmayê hişyar dikin. Nifşê duyem, şîna bavê xwe ya ku temam nebûye domandiye, bi hêrseke zêde û xemgîn, mîna bavê xwe berê xwe daye bikaranîna zêde ya cixare û alkolê ku zerarê dide tendirustiyê. Ev mînak nîşan dide ku gava trawma neyê axaftin, pêvajoya şînê temam nebe û rûbirûbûn pêk neyê birîn nayê girtin; berovajî, şekil diguherîne û jiyan, tendirustî û pêşeroja nifşên paşê tarî dike.

**Trawma û windakirina kontrolê**

Hêmana herî bingehîn a ku trawmayê dike trawma ew e ku kesê rastî rûdanê tê li hemberî wê bêçare dimîne û kontrola li ser jiyana xwe winda dike. Ji karesatên ku di kêliyekê de diqewimin bêhtir, rûdanên ku nikarin bê kontrolkirin û mirov midaxele bike, bandoreke trawmatîk diafirînin. Trawmayên ku bi destê mirovan tên kirin, mexdûran bêhêz û bêparastin dikin.


Di vir de rola hafizeya civakî dikeve dewrê. Piştî rûdanên trawmatîk, heger beşeke civakê êşên hatine jiyîn înkar bike, tune bihesibîne yan meşrû bibîne, beşa din bi van êşan re tenê tê hiştin. Ev rewş di civakê de dibe sedema "qelişîna hafizeyê". Tunehesibandina tiştên ku hatine serê mexdûran, bandora trawmayê kûrtir dike. Li hemberî vê, avakirina hafizeyeke hevpar li dijî bandorên rûxîner ên trawmayê xala xweragiriyê ya herî xurt e. Ev jî bi bîranîn û qeydkirina bûyeran û bihîstina dengê mexdûran pêk tê.

**Heqîqet, edalet û telafî**

Ji bo sererêkirina bi trawmayên civakî yên berdewam re û pêkanîna başbûnê, tenê piştevaniya derûnî ya takekesî yan klînîk têrê nake; divê gavên civakî û hiqûqî bên avêtin, ev şert e. Ev pêvajo li ser sê lingên bingehîn ava dibe: Heqîqet, edalet û telafî.

Gava yekem a pêvajoya başbûnê, bersiveke dirust bo wê pirsê ye ku "çi qewimî?". Mafê heqîqetê ne tenê aşkerekirina daneyên veşartî ye; ew, têgihiştin û watedarkirina civakî ya sedem û encamên rûdanane jî. Ji bo vê yekê, divê çîrokên mexdûran li qada giştî bên bihîstin, "kompioya bêdengiyê" bê şikandin û polîtîkayên înkarê yên fermî bi dawî bibin; çimkî ji bo destpêkirina pêvajoya şînê şertê pêşîn aşkerekirina heqîqetê ye. Di vê çarçoveyê de edalet gelekî girîng e, lewra çanda bêcezatiyê dibe sedem ku trawma kronîk bibe, birîn hertim xwînî bimîne û tundî bê teşwîqkirin. Darizandina failan û qebûlkirina berpirsiyariyê, ji bo vegerandina rûmeta mexdûr û jinûveavakirina hesta ewlehiyê gelekî girîng e. Ji bilî edaleta cezakirinê, neheqiyên civakî jî ji bo pêvajoya başbûnê şertekî bingehîn e. Divê ev neheqî ji holê bên rakirin. Pêngava sêyem telafî ango başbûn e; armanca vê ew e ku mexdûr vegerîne rewşa berî trawmayê, lê di binpêkirinên giran de anîna windahiyan ne pêkan e. Ji ber vê yekê pêvajoya başbûnê gelek pêngavan vedihewîne: Tezmînata madî, lêborînxwestina jidil a dewletê yan a failan û cihûwarên bîranînê. Herwiha, ew garantiya ku ev rûdan 'careke din dê qet neqewimin' jî şertekî vê pêvajoyê ye.

Weke encam, trawmaya civakî ne rûdaneke ku di rabirdûyê de qewimiye û qediyaye; ew, pêvajoyeke zindî ye ku bandorên wê bi rêyên biyolojîk, derûnî û civakî bi nifşan didomin. Ji bo başbûnê şert e ku bêdengî bişike, rastî derkevin holê û şîneke hevpar bê girtin. Ji bo trawma derbasî nifşên nû nebe, divê em êşan înkar nekin; berovajî, divê em bi wan re rû bi rû bibin, edaletê pêk bînin û hafizeyeke hevpar ava bikin.



***ÇAVKANÎ***

Hunler, O. S., Namer, Y. ve Duzen, N. E. (2023). Bildiğimiz akademinin sonu: Travma politikası karşısında kolektif hafıza inşası. Egitim Bilim Toplum Dergisi, 21(81), 56-75.

Karatay, G. (2020). Tarihsel/toplumsal travmalar ve kuşaklararası aktarımı biçimleri üzerine. Surekli Tıp Egitimi Dergisi (STED), 29(5), 373-379. doi:10.17942/sted.767797

Karatay, G. ve Gunderci, A. (2023). Tarihsel/toplumsal travmaların kuşaklararası psikososyal etkileri: Dersim 38 orneginde bir olgu sunumu. Uluslararası Anadolu Sosyal Bilimler Dergisi, 7(1), 282-291. doi:10.47525/ulasbid.1232387

Turkiye İnsan Hakları Vakfı (TİHV). (2012). Turkiye'de surmekte olan toplumsal travma ile başetmede ilk adımlar. TİHV Yayınları.

# Celado seserre

Dewleta tirke mîyanê se serran de vera şarê kurdî xeylêk qetlîyamê hovaneyî viraştî. Hişmendîya celadî nika zî ciwîyena. Estîya şarê kurdî rê gefan wanena, kultur û kamîya ey nêşinasnena

Merkezê Xeberan

Mîyanê partîyanê tirkan de nê rojan babeta "celadî" yena nîqaşkerdene. Muxalefeto serekeyî îqtîdarî sey "celad" sûcdar keno. Îqtîdar zî muxalefetî sey celad vîneno. Her di terefî qebûl kenê ke vera şarê kurdî celadîye kerdê. Komara Tirkîya de anatomîyê celadîya vera şarê kurdî reya verêne heta serra 1921î şino. Kurdanê Qoçkirî waşt ke wayîrê otonomî bibê û na çarçewa de îdareyê Anqara rê telgrafêk erşawitî. Labelê qet cewabêko medenî nêdîya înan. Bi fermanê îdareyê Mustafa Kemalî leşkeran Qoçkirî de hêz şuxilna û kurdî qir kerdî. No qetlîyam eserêkê celadî yo yewin bî.

Celadî qerar dabî ke estîya şarê kurdî wedarno. Coka serranê 1920an de vera şarê kurdî polîtîkaya qirkere domnaye. Dêrsim de serra 1926 de vera eşîra Qoçanî operasyono leşkerî ame serûberkerdene û xeylêk kirmancî ameyî qirkerdene. Çike qoçanijî mêrxas bîyî, şervan bîyî, xoverdayox û têkoşer bîyî. Çike qoçanijî îqtîdarê celadî rê teslîm nêbîyî. Xora serekê eşîra Qoçanî Îdare Îbrahîm Agayî wina vatbî: "Ez hênîyê Dewleta Osmanî ra awe nêşimena. Çike awa ey gemarin a". Îdare Îbrahîm Agayî zanayêne ke dewleta tirke ci xêr çin o. Ey texmîn kerdêne ke îdareyê celadî rojêke vera qoçanijan têgêreno û înan qir keno.




**Qetlîyamê Zîlanî**

Celadî rolê xo yo serekeyî yew zî serra 1930 de Zîlan de kay kerd. Tîya de fekafek 15 hezar kurdî bi destê îdareyê Mustafa Kemalî bi hovî ameyî qirkerdene.

Armancê celadî peynîya qirkerdişî de amebî zelal kerdene. Celadî serê koyî de nuştbî ke "Kurdîstan tîya de defnkerde yo". Yanî celadî waşt welatê kurdan çin bikero.

Celadî de hişmendîya Partîya Îttîhat û Terakkî (PÎT) est a. Senî ke PÎTî seba sazkerdişê welatê tirkan bi mîlyonan armenîyî qir kerdî, senî ke na partîye plan kerd ke elewîyan musluman bikero û kurdan tirk bikero, kemalîstan zî na polîtîkaya nîjadpereste domnaye. Qetlîyamê Zîlanî leteyê polîtîkaya qirkerdişî yo.

**Îsmet Înonu û Celal Bayar**

Celadî Dêrsim de zî wezîfeyê xo yo "bimbarek" ard ca. Seba celadî çinkerdişê şarê kurdî wezîfeyo tewr bimbarek o.

Estîya ey pabesteyê çinkerdişê kurdan a. Nê konteksî de bi des hezaran kirmancî serranê 1937-38an de ameyî qirkerdene. Celadî nê qirkerdişî de her tewr metodo barbar gurêna. Ewro merdim vîneno ke îqtîdar sûcê qirkerdişî têna erzeno muxalefetî ser. Wa bêro zanayene ke heta 15ê teşrîna peyêna 1937î Ismet Inonuyî serekwezîrîye kerde û bi zanayîşê Mustafa Kemalî qirkerdiş îdare kerd. La 15ê teşrîna peyêne de gama ke 7 seyîdê Dêrsimî ameyî daliqnayene, Îsmet Inonu êdî nêwaşt serekwezîrîye bikero. Ey ra dima Celal Bayarî no wezîfe girewt xo dest. Senî ke Îsmet Înonu CHP'yî temsîl keno, Celal Bayar zî AKP'yî temsîl keno. Wirdî merdiman zî vera şarê kurdî "celadîye" kerde.

# Benî Cehîr û nîzamê dewlete



Ubeydullah Serhildan Andan

Serrêk ra zede yo ke Tirkîya de prosesêkî dest pê kerdo. Nê prosesî bi silamdayîşê Dewlet Baxçelî û vengdayîşê Rayverê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî dest pê kerd. Bi vengdayîşê 27ê sibata 2025î; no proses bi di gamanê muhîman ser o heta ewro ame û nika ra pey verê xo tadano kamcîn hetî kes nêzano. Çîyo baş o yo ke cemedê mabênê kurdan helîneno û wina aseno ke no helîyayîş verê ma tadano çiyanê neweyan. Û mabênê kurdan de nîqaşê tarîxî dano kerdiş.

Birêz Ocalan destpêkê nê prosesî ra heta nika gelek reyî qala biratîya kurd û tirkan a hezar serran kerd. Qala dewrê Selçûqîyan û kerdenanê înan kerd. Ê wextî de estbîyayîş û statûya kurdan ser o persan kerd û bi tespîtanê xo waşt ke ma pêro verê xo bidî tarîxî. Çunkî Birêz Ocalan heme fikrîyatê xo bi ewnîyayîşê xo yê xas ê tarîxî viraşt û nika zî verê ma tadano tarîxo ke ma ra ameyo nimitiş. No tarîx mîyanê xo de zaf meseleyanê giranan hewîneno; înan ra yew zî meseleya Benî Cehîrî yo.

**Selçûqîyî û Merwanîyî**

Hezar serre verê cu nameyê biratî mabênê kurd û tirkan de ame panayîş; Alparslan bi hetkarîya kurdan ravêrt Mezopotamya û dima ra zî berê Anatolya akerd. Ê wextan de kurdî eşîrtî, mîrektî û nînan ser de zî konfederasyon ser o pergalê xo awan kerdibî. Pergala ke raşteraşt sey dewlete bêra namekerdiş mîyanê kurdan de zaf çînbî. La kurdî wayîrê erdê xo bîyê; cêr de binê hikûmranîya Ebasîyan de cor de zî binê banê Merwanîyan de wayîrê pergalêk-dewletêk bîyê.

Alparslan o ke pê kurdan paştê Bîzansî eşkayo bîyaro war dima ra dewleta xo Selçûqî mîyanê Mezopotamya û Anatolya de kerd hîra. Na dewlete mîyanê xo de kurdan zî hewêna. Badê Alparslanî lajê ey Melîkşahî dewrê xo de erdê dewleta xo hêna zêde kerd hîra û mabênê kurd-tirkan de polîtîkayêka aqilane ramite. Nê dewran de dewleta kurdan Merwanî hema zî pay ser o ya; seba ke kurdî wayîrê erdanê xo yê Melîkşahî cayê ke kurdî tede yê ra vato Kurdîstan. Helbet a seserre de meseleyê netewî-nijadî zaf aver nîyo; zafêr meseleyê dînî ser o kamîye virazîyaya. La na nêna a mena ke kamîya netewî zî çîn a. Her çiqas Melîkşah bi kamîya tirkîtî nêzdîyê kurdan nêbîyo; bê hesab zî nêvinderto.

**Rolê Benî Cehîrî**

Benî Cehîr – Faxrudewle Mihemed b. Cehîr; serdemê Melîkşahî de aktorêko kurd o. No merdim û keyeyê ey Selçûqîyan ra xizmet kerdê û dewrê Selçûqîyan de wezîrtî, şewirmendî û gelek qedemeyanê dewlete de xebitayê. Benî Cehîr parçeyê hesabê Melîkşahî yo; seba Selçûqîyan dima ra zî seba heme dewletanê tirkan bîyo modelo sereke. Çunkî Benî Cehîr bi fen û dolebanê xo Merwanîyan hikûmranî ra visnayo û dima ra zî bîyo waliyê Dîyarbekirî yê serdemê Melîkşahî. Benî Cehîr hetêk ra xizmetê Melîkşahî de bîyo hetêk ra zî şarê xo dayo qebûlkerdiş ke statûya înan do her tim binê dewletanê ke hetê netewanê bînan ra ameyê awankerdiş de bibo. Na kerdene bi serran o ke sey nîzamê dewlete ameya qebûlkerdiş û nê nîzamî ser o sere de kurdî dima ra zî heme şar û bawerîyî ameyê îdarekerdiş.

Çira ma verê xo tada Benî Cehîrî? Gelo Benî Cehîr semedê kurdan se kerdo? Eke çiyo ke kerdo baş bo kurdî çira qala Benî Cehîrî û keyeyê ey nêkenê? Çira wexto ke qala biratîya hezar serran beno raşteraşt nîzamê dewlete-kerdena dewlete yenê kurdan vîrî?

Birêz Ocalan bi manîfestoya xo ya 2025î kurdê sey Benî Cehrî bê ke name bido nîşanê ma pêrûnan da. Û nika hetê dewlete ra gêrayîşê Benî Cehîrêko newe est o; aseno ke dewlete na hewe mîyanê tengasîyêka pîle de ya. Çunkî bi helîyayîşê cemedê mabênê kurdan Benî Cehîr merd û do ruhê ey zî bi awankerdişê hişmendîyêka modern a kurdan bimiro!

# Hîlêyê TC'yî nêqedîyenê!



Ehmedê Bira

Tarîxa TC'yî de tenê verbê kurdan nê, verbê dewletanê xerîban, semedê taxtê îqtîdarî û zwb. bi dek û dolaban û bi xapeynayîş û îxanetan pir o. No îxanet hinî gird o ke, zereyê qesranê (sarayî) osmanîyan de birayan, birayanê xo yê pitik yê dergûşî de yo zî, qetil kerdo yo. De şima hesap bikerê ke kurdan ver de, çiqas îxanet û qirkerdiş û faîlê mechûlî kerdêy ke textê xo vinî nêkerê û hewna zî dek û dolabê înan doşa kurdan ser de yê.

Proseso ke Serek Apoyî da verî û na gamî dayo destêkerdişî ra, heta ney gamî, rojeke zî mi bawer nêkerd. Çimkî PKK'yî her ray gamê weş û geşî eştî la TC'yî gamê şênberî nêeştî. Hewna zî ez bawer nêkenî. Çimkî jest û mîmikê TCyijan, vatişê înan, têgeyrayîşê înan de heta na gamî, jey prosesanê verînan, averşîyayîşêk zî çîn o. Kişta bîne de PKK'yî gamê şênberî zaf rayî eştî û girweyê xo zey na gamî bi temamî arde ca...

TC muzakerayan ra çiqas erey bimano do hintayê zirar bikero. Yanê, TC do zey laşo ke, meydana dewêke de tîncî vero vinderte bo û boy dano, do boy bido. Mezgefezayî (Homa) bikero, ez şaş bî, aştî û aramî ra, TC berê xo heta peynî akero...

Birêz Seyîd Rizayî wina vatbî: "Mi bi hîlêyê şima baş nêkerd mi ra bi derd, mi zî, şima ver de çong nêda erdî, wa no zî, şima rê bibo derd..."

Ez fikirîyayîşê xo de, hertim vatişanê vernîyanê xo, semedo ke mezgê mi jey mûmeke roşnî bikero ra, zaf bi qîmet vînenî û rayîra xo bi tecrûbeyê înan xêz kenî.

Yanê ez vanî ke, eke wina bi hîlê û dolaban polîtîkayî bêrê viraştiş, do çend rojanê ma ver de, TC heta qirika xo do bikûro çala sila xo û verbê helisyayîşî de, bikûro hewneke zey merdişî.

Eke TC aştî wazeno, lazimo intê (înat) xo ra bêro war. Eke nêyro war, zey Serek Apo vat, "Alternatîfê kurdan est ê û nêqedîyenê..." Çimkî kurdê verî nîyê. Semedo adiro ke est o têfînê ra, her ferdê kurd yê dinyayî de boy genêy, goreya xo, bi satilan awk onceno, adiro ke zalîmîy wazenêy gur bikerêy, têfînêy.

**Şerê Dinya yo 3. berî verde yo!**

Zalimîy semedê Asyayî têmîyan bikerêy ra bi heme qiwetanê xo yê aborî, sîyasî, sosyolojîk û psîkolojîk, şereke serd ya bi des seran verî romnaynêy. Ewnîyay ke no qîm nêkeno, çend serranê peynîyan de, şereke germine ra hadreyeyî kerdîy. Serek Apo no plan rewna hîs kerdbî ke, kurdîy zirara herî tayn bivînêra gamê aştî eştî. Kişta bînî ra zî, waşt ke şarê TC'yî cuyene ra zî zirar nêvînê û meclîsa TC'yî ra birateya kurdan tesdîq bikerê ke pîya bişêkyê rayîr bigerêy...

Rayberanê tirkan rojeva germine hewna weş fam nêkerdê, nêzanêy ke do çiçî bêro serê Anatolîya û Asya... Kurdîy bi des serrano ke şerêkê germin û sosyolojîkî mîyan de yê, tayn zaf mûsayeyê şerî yê. La şarê TC'yî çiqas hadre yê?

**Wa TBMM girweyê xo bîyaro ca**


Heta ke problema tirkan ya ewnîyayîşê kurdan hal nêbo û TBMM de bi qanûn ca nêgero ke kurdîy welatijêy eslî yê cayê xo yê, no mîr do hewna zaf awk bionco.

Serek Apo û giroteyê azadîye azad nêbêy, qanûnê TBMM'yî nêbedîlyo, edaleta goreya kurdan pêk nîyero, semedê ziwan û averberdişê zanisteyî dibistan û zanîngehan de qanûna Japonya meyro erêkerdiş, halê kurdan û tirkan do wina dewam bikero...

**Rojawan xeta sûr a**

Lazimo ke bi lez û bez TC Rojawan ra bivejyo. Çeteyanê xo oca ra bionco û înan bi temamî pasîf verado. Rojawan û Başûrê Kurdîstanî bin banêkî de meclîsêke awan bikerêy. Çimkî amayîşêkê kilmekî de qewimyayîşêy zaf girdîy do bibêy eyseno. Sifte semedo ke ma kurdîy û şarê mazlûmî yê Asya û Anatolîya zirara herî tayn bivînêy ra, na gamî ra xebatîy gerê bi lez û bez bivirazyê.

Nê semedî ra, lazimo Rojawan bibo xeta sûr ya kurd û şaranê mazlûman. Wa heme kes bizanêy ke xelisyayîş do Rojawan ra dest pê bikero, Başûr de bi encam bibo, Bakur de do Kurdîstanêke bi qanûn awan bibo, Rojhilat û kurdê belûcî, peştî, azerî, ermenî û yên bînan bigo boxçeya kurdan mîyan û dewletêka konfederal ya kurdan awan bibo ra têgeyrayîşî ferz êy.








Kewê Redkan

# Porteqal porteqal e

Li welatê me Serhedê, navên me hemûyan gelekî kurdewar in. Ger te hinek nav bihîstin ku bi te xerîb an jî di nav hişê te de tevlîhevî çêdibe, bizanibe ku tu li Serhedê yî. Hinek ji van navan: Susan, Gezo, Şekir, Zeytûn, Porteqal, Zenûre, Xanim û her wekî din, bi hezaran navên me yên wisa hene ku xelkên din dema ku van navan dibihîsin ecêb dimînin. Lê qet ji me re ecêb nayên, em bextewar in ku navê me hemûyan ji bingeha çand û hunerê tên. Hemû hevalên min ev nav li ser wan in. Em ji xwe û navên xwe razî ne. Gelek caran ên xerîb dema navên me dibihîsin, ne dikarin bikenin, ne jî dikarin maneya wan hîn bibin.

Hevala min a ew jî di emrê min de ye, Porteqal!!! Ez ji wê pir hez dikim, ew hinekî ji min bedewtir û ji min bejnbilintir e, lê qet xem nake, ez ji wê û hevaltiya wê hez dikim. Hemû kar û barê me bi hev re ye. Em qet ji hevdu naqetin, hevalên me yên din jî wisa nin. Wan rojên hanê me bihîst ku hinek merivên ne ji gundê me lê ji der û dora gundê me hatine ji lawikên xwe re keçikan bibînin û bi lawên xwe re bizewicînin.

Ecêbeke reşegiran! Ev çi aqil e ku di serê wan de ji xwe re gund bi gund digerin seba keçikan bikin bûka mala xwe? Dema me bihîst, em ji kena mirin. Xwezila we em bidîtana ka me çawa henekên xwe li wan dikir.

Paşê me bihîst ku xwestine bibin mêvanê mala bavê Porteqalê. Min dît ku Porteqal bi hêrs hêsirên çavan dibarîne. Dê û bavê wê gotine mêvan mêvanê xwedê ne, bila bên. Porteqal jî dibêje; ‘Ez naxwazim ew bên mala me, lê çima dayik û bavê min gotin bila bên?’

Ez naçim malê ku heta ew ji mala me derkevin û herin. Dayika min got; ‘Porteqal, delala nav dilê me, heyfa wan hêsirên te ku tu dibarînî, ez dayika te û bavê te jî baş nas dikim, dibe ku wan nexwestiye bêhurmetî bikin lewma gotine bila bên. Wekî din tu xema neke û xwe jî aciz neke. Here malê, ji wan mêvanan re hurmeteke baş bike, dema waxtê wan hat, wê rabin û herin.’

Ez jî li pey wê çûm mala wan ku hinek alîkarî bikim û him jî ka bibînim ew kî ne? Em çûn, bi vir de û wê de, ezet û hurmet... Jina mêvan got keçika bedew gelo navê te çi ye? Wê jî bersiv da got; ‘Navê min Porteqal e.’ Jinikê pêşî fêm nekir, got qey ew henekê xwe li wê dike. Careke din pirsî, wê jî careke din bersiv da û bi dengekî bilind got; ‘Navê min Porteqal e.’ Jinikê li der û dora xwe nihêrt, wisa lêva xwe gez kir, nedikarîbû bikene û ne jî dikarîbû tiştekî bêje. Lê dîsa jî got; ‘Porteqal? Yanî ew porteqalên ku em dema zivistanê dixwin ew e?’ Porteqalê got; ‘Erê hema ew e.’ Jinikê got, ‘Qey dê û bavê te navekî din nedîtin ku ev navê fêkiyan li te kirine?’ Hevala min got; ‘Na, dê û bavê min jî ji vî navê min hez dikin û ez jî bi navê xwe serbilind im. Porteqal Porteqal e, ne tiştekî din e.’ Û bi lez ji oda wan derket.

Bavê wê hat cem jê re got; ‘Keça min, ew mêvan in, bêhurmetî ne baş e, here lêborîna xwe ji wan bixwaze û pirs bike, gelo ew rehet in an na? Tu jî dizanî ez şekirên bajarên din naynim mala xwe, Porteqala xwe jî wisa nadim bajarên din. Niha here cî û nivînên wan deyne, bila rehet razên, ew ê sibe rabin û herin. Ger careke din qerfên xwe li navê te bikin, bersiveke min heye ji bo wan.’

Apê Sêvdîn çiqas apekî bêhnfireh û aqilbend e. Sibetirê ew mêvan qet behsa tiştekî nekirin, taştêya xwe kirin û ketin ser rêya xwe û çûn. Ez û Porteqal hê jî dema tê bîra me em dikenin. Porteqal çi ye? Porteqal Porteqal e. Ev navên me ne. Em ji xwe hez dikin...



# Tiştanok

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1-Mamê mino***
Her ku tu jê jêdikî ew mezintir dibe
Ew çi ye?

***2- Mamê mino***
Herdem li pêşiya te ye lê tu wî nabînî
de bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

**1 -** Goncal, kurtal **2-** Pêşeroj, siberoj

# Melayê meşhûr û kurê wî

**Abdullah Ongullu**

Rojekê Melayê Meşhûr li kerê xwe siwar bû û kurê wî jî li pey kerê di rê de diçin. Komeke mirov rastî wan tê, ji hev re dibêjin:

“Mêze bikin ew bi xwe li kerê siwar bûye, li rehetiya xwe dinêre lê kurê wî yê biçûk dimeşe, ev çi wijdan e?”

Mela ji kurê xwe re dibêje:

“Va ye milet wisa dibêje ka ez werim xwarê û tu siwar bibe.”

Wisa dikin. Hinekî din diçin komeke din li wan rast tê, ji hev re dibêjin:

“Hûn dibinin, ew ê ciwan li kerê siwar bûye, ev kalê reben peya diçe.”

Mela dibêje:

“Madem ev herdu jî nabin vê gavê em herdu bi hev re li kerê siwar bibin.”

Herdu li kerê siwar dibin. Piştî demekê komek miletê din di ber wan re derbas dibe û ji hev re dibêjin:


“Ew çiqas bê wijdan in, herdu bi hev re li kerê siwar bûne.”

Herdu têne xwarê û kerê vala didin pêşiya xwe. Çendekî din dîsa komek li wan rast tê û dibêjin:

“Ev çiqas ehmeq in. Ma aqil nakin yek ji wan li kerê siwar bibe.”


Mela li kurê xwe dizivire dibêje:

“Te bi xwe dît, ne gengaz e ku mirov kesî razî bike. Tu çi bikî teqez wê hinek kirinên te xelet bibînin û te rexne bikin. Tu tiştên rast bike, kî çi dibêje bila bêje.”



# XAÇEPIRS

a




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Çadir. ***5-*** cînavkeke pirjimar. ***7-*** Ne zindî ***8-*** Cihê ku genim lê tê hêran. ***9-*** Derewîn. ***13-*** Navekî jinan. ***14-*** Vê carê. ***16-*** Îrade. ***19-*** Nivîsa ku ji çend gotinan pêk tê. ***20-*** Agir. ***21-*** Alava ku bere erzaqên malê tê de hiltanîn. ***22-*** Kar û xebat. ***25-*** Dayik. ***26-*** Dijberî neyênî. ***28-*** Bavê hevjîna mirov dibe…

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Rêbazî, rêbazê heman olî lê hinekî ji hev cüda ne.
***2-*** Bajarekî rojhilatê Kurdistanê.
***3-*** Cînavkeke pirsiyarî
***4-***Xwarineke sereke
***6-*** Kesê ku li aşê genim dihêre.
***10-*** Kok, damar.
***11-*** Balendiyekî kedîkirî.
***12-*** Ol.
***15-*** Meheke biharê.
***17-*** Pêwirdarê li camiye azan dide.
***18-*** Fêkîyekî havînê
***20-*** Jineke sembola berxwedana Kobanê.
***23-*** Ne nêzîk.
***24-*** Bersiva erênî
***27-*** Rojeke hefteyê.

## Bersiva hefteya borî



# Bi çanda komunal awazên gelan

**Mihrîcana Orkêş a Muzîkê, bi feraseta neteweya demokratîk tê lidarxistin. Ji gelek netewe, ol û baweriyan kom beşdarî mihrîcanê dibin. Mihrîcaneke pirzimanî ye, her netew dê bi deng û rengê xwe beşdar bibin û dê di mihrîcanê de awazên kurdî, ermenkî, erebî, suryankî olan bide**




## 23 kom û hunermend beşdar dibin

Bi giştî hejmara hunermend û komên ku derkevin ser dikê 23 ye. Mihrîcan dê bi konsera Jînda Qanjo dest pê bike û di roja sêyemîn de bi konsera Koma Ş. Zîlan bi dawî bibe. Kom û hunermendên ku beşdar dibin ev in; Koma Botan (Qamişlo), Koma Ş. Esmer-Hîlala Zêrîn (Kobanê), Koma Ş. Xebat (Tirbespiyê), Koma Ş. Hêva-Hîlala Zêrîn (Kobanê), Koma Serdem (Hesekê), Koma Sayat Nova (Ermen), Koma Vejîn-Hîlala Zêrîn (Heleb), Koma Roj (Zaxo), Koma Tolhildan (Hesekê), Koma Hêlîn Cûdî-Hîlala Zêrîn (Reqa), Koma Agirî (Amûdê), Koma Şoreş (Til Temir), Koma Delîla-Hîlala Zêrîn (Amûdê), Koma Med Muzîk (Peymangeh), Koma Gîvara (Kobanê), Koma Elefterya-Hîlala Zêrîn (Dêrik), Koma Mîrzo (Şengal), Koma Dîret El Furat (Tebqa), Koma Gerstêrk-Hîlala Zêrîn (Hesekê), Koma Roj (Dirbêspiyê), Koma Şehîd Zîlan (Dirbêsiyê) û Dîfaf El Furat (Reqa).

| Mihemedê Besê

Mihrîcana Orkêş a Muzîkê ya 3yemîn dê îsal bi dirûşma 'Bi çanda komunal deng û awazên gelan vedijin' bê lidarxistin. Mihrîcan dê 8ê kanûnê dest pê bike û 10ê kanûnê bi dawî bibe. Di mihrîcanê de bi giştî 23 kom û hunermend dê derkevin ser dikê û stranên xwe bibêjin.

Mihrîcana Orkêş a yekemîn, sala 2017an, di bin şert û mercên giran û geşedanên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yên wê demê de hat lidarxistin. Di wan salan de li Girê Spî, Serêkaniyê û Efrînê hem şer hebû hem jî koçberiyeke mezin çêbû. Ji ber vê yekê 6 sal navber hat dayîn û mihrîcana duyemîn jî sala 2023yan hat lidarxistin.



Hevseroka TEV-ÇANDê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Sumeyye Mihemed têkildarî Mihrîcana Orkêş a Muzikê ya 3yemîn ji rojnameya me re axivî. Sumeyye Mihemed, da zanîn ku ev demek e amadekariyên lidarxistina mihrîcanê tê kirin û wiha axivî: "Mihrîcan du salan carekê tê lidarxistin. Ne tenê komên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê her wiha gelek komên parçeyên din ên Kurdistanê û derveyî welat jî beşdarî mihrîcanê dibin. Komeke muzîkê ji Zaxoyê, komek ji Şengalê, hunermendek jî ji Silêmaniyê beşdarî mihrîcanê dibe."

**Ji bo kom û hunermendan bang**

Sumeyye Mihemed, da zanîn ku xwestine komên ji bakur û rojhilatê Kurdistanê jî beşdarî mihrîcanê bikin lêbelê ev kom ji ber şert û mercên heyî beşdar nebûne. Bi domdarî Sumeyye Mihemed destnîşan kir ku dê di mihrîcanên salên pêş de hewl bidin sînoran ji holê rabikin û komên Bakur û Rojhilat jî beşdarî mihrîcanê bikin. Sumeyye Mihemed, xwest kom û hunermendên parçeyên din jî bo mihrîcana din ji niha ve xwe amade bikin.

**Mihrîcaneke pirawaz û deng**

Di berdewama axaftina xwe de Sumeyye Mihemed diyar kir ku mihrîcan bi feraseta neteweya demokratîk tê lidarxistin, ji gelek netewe, ol û baweriyan kom beşdarî mihrîcanê dibin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Mihrîcaneke pirzimanî ye. Dê di mihrîcanê de awazên kurdî, ermenkî, erebî, suryankî olan bidin. Di mihrîcana ewil de hejmara komên ji neteweyên din hinekî kêm bû. Di mihrîcana duyemîn de hejmara komên neteweyên din zêdetir bû û îsal dê bêhtir komên muzîkê beşdar bibin. Îsal her netewe, bi deng, stran, awaz, cil û bergên xwe beşdar dibin. Ji ber ku bi beşdariya her neteweyê wek TEV-ÇANDê em pir kêfxweş in."

**Dirûşma mihrîcanê**

Dirûşmên mihrîcanê jî li gorî ruhê demê tên diyarkirin. Mihrîcana îsal bi dirûşma ***"Bi çanda komunal deng û awazên gelan vedijin"*** tê lidarxistin. Mihrîcan herî dawî sala 2023yan de hatibû lidarxistin ku dirûşma wê jî ***"Bi dengê pîroz şoreş ava dibin"*** bû.

---

# Ji rojnameya **Azadiya Welat** heta **Ajansa Welat**



Yaşar Eroglu

27ê mijdarê rojeke pîroz e ji bo gelê kurd. Biryara birêxistin û birêkûpêk mudaxeleya dîroka kurd û Kurdistanê roja 27ê mijdarê hatiye dayîn. Biryara azadbûna ji hemû qeyd û bendên xwe ya gelê kurd e. Gelê kurd bi vê biryarê li xwe vegeriya û bû hêzeke bi milyonan.

Ajansa Welat jî roja 27ê mjdara 2024an hat avakirin. Di piştperdeya biryara Ajansa Welat de ev hişmendî heye û reh û rîşiyên xwe digihîne vê rojê û vê biryarê. Roja 27ê mijdarê, bi têkildariya salvegera avakirina Ajansa Welat û bi şahiya salvegera wê, me careke din ev hişmendî bi bîr anî û salvegera wê pîroz kir.

Ajansa Welat li ser kevneşopiya rojnameya Azadiya Welat ku daboriya wê jî ji rojnameya Welat û Dengê Welat tê, êdî li ser lihevkirineke giştî heye ku em hemû vê mîrateyê bi navê Azadiya Welat bi bîr bînin. Bi rastî jî navê Azadiya Welat li vê mîrateyê tê.

Rojnameya pêşîn bi navê Welat heftane hat weşandin. Rojname piştî rojnameya Welat bi destê dadgehê hate qedexekirin, bi navê Dengê Welat weşana xwe domand. Sala 1996an bi navê Azadiya Welat weşana xwe dewam kir. Sala 2003yan ji Stenbolê hate ser axa welat, navenda xwe li Amedê ava kir. 15ê tebaxa sala 2006an weke rojane dest bi weşana xwe kir, di dîroka rojnamegeriyê ya bakurê Kurdistanê de bû rojnameya pêşîn a rojane. Azadiya Welat di 28ê tebaxê sala 2016an de bi destê hikûmeta pergala serokkomariyê ji binî ve hat qedexekirin. Xebatkarên rojnamegeriya kurdî serî netewandin, weşanên xwe bi awayê dîjîtal li ser înternetê bi navê e-rojname, Welat berxwedana xwe ya li ser esasên rojnamegeriya kurd dewam kirin. 21ê kanûnê sala 2020an rojnameya Xwebûn weke rojnameya heftane ya bi kurdî, li ser kaxiz dest bi weşana xwe kir.

Şert û mercên civak, çand, ziman û geşedanên siyasî, li ser erdnîgariya Kurdistanê ji bo ajanseke xwerû bi kurdî hewcedarî derxist pêş. Li ser bingeha vê hewcedariyê, 27ê mijdara 2024an, Ajansa Welat bi dirûşma 'Deng û Rengê Welat' dest bi jiyana rojnamegeriyê kir. Di şertên Ajansa Welat derxistin ser platforma rojnamegeriyê de, ji aliyê kadro, teknîk, daxwaz û berdewamiyê ve civaka kurd kemilîbû û pêdivî bi ajanseke kurdî hebû. Xebatên wê yên di saleke borî de ev yek pişrast û pesend kir. Ev yek, ew nîşane bû ku ev biryar di cihê xwe de hatiye dayîn, têrê dike ku jiyana xwe weke ajans dewam bike û xebatên xwe kûr û berfireh bike.

Ajansa Welat li ser wê kedê û wan nirxan ava bûye ku pişta xwe dide bi dehan, hezaran cangoriyên vî welatî, bi taybetî jî cangoriyên di rêya çapemeniya azad de meşiyane, jiyana xwe feda kirine. Bi satoran, bi gule, serwindakirin, îşkence, girtinan re rû bi rû maye û ji van qewmînên giran niziliye, hatiye îro. Ev nirxeke giranbuha ye. Kurteya vê têkoşînê ev e ku her tim xwe ji nû ve ava kiriye, berdêl dane û bi vîneke mezin di rêya xwe de meşiyaye.

Îro liserpiyanmayîna rojname û ajansên bi kurdî û hemû dem û dezgehên pergala tevgera azadiyê bi vê rastiyê ve girêdayî ye, vê rastiyê pesend dike. Hêvî, peywir û berpirsiyarî ev e; hemû ev sazî û dezgehên kurdî li gorî pêdiviyên serdema nû xwe nû û xurt bikin, di rêya Aştî û Civaka Demokratîk de bimeşin û bi hêz bibin.

Ajansa Welat bi vê piştperde û bi van nirxên giranbuha roja 27ê mijdarê ji bo salvera xwe şevek li dar xist, 27ê mijdarê bi şahiyekê pîroz kir. Peyamên hatin xwendin bi piranî li ser nirxên Ajansa Welat derxistin holê, şehîdên wê, fedakarî û girîngiya çapemeniya azad, pê re girîngiya Ajansa Welat bûn. Salon, bi xebatkarên çapemeniya azad, sazî, partî, dostên nêzî çapemeniya azad, piştgirên wê, xwîner, şopdarên çapemeniya azad dagirtîbû.

Em ji qonaxa belavkirina belavokên vaşarî hatine gihîştine salonên bi xebatkar û dostên çapemeniyê dagirtî yên aşkere û legal. Rêvebirina bajaran ketiye destê kurdan û çend rêvebirên wan jî di şahiyê de amade bûn. Ev hemû kêl bi kêl, bi kedeke bêhempa û xwîna şehîdan pêk hatine. Qonaxeke berz e, divê bi xetên stûr bê diyarkirin.

Şahiya pîrozbahiyê layiqî şevê bi govendê û konsera hunermend Arhat berpê bû. Ji bilî serkeftîbûna şevê tişta bala min kişand helwesta şaredarên bajarê mezin ên Amedê bû. Şaredar hatin weke hatineke asayî, weke her kesî; ne xwepêşdan, ne qeretî, ne jî artêşeke dû wan hebû. Bi kesên wê derê re haşir û neşir bûn. Serra Bûcak derket ser dikê, şaşa û xwepêşdan tune bû. Bi kurdî gotara xwe xwend, lêborîna ji bo kêmasiya xwe ya kurdî xwest, hat û rûnişt. Dogan Hatun jî mutewazî û samîmî tevdigeriya, weke heval û dostan; ne bi jor ve. Ez kesayeta wan, xebatên wan berfireh nizanim; belkî di karê xwe de serkeftî bin, ne serkeftî bin, bi kûrahî nizanim. Lê di vê şahiyê de bala min kişand û ez kêfxweş bûm. Ji aliyê têkildariyê ve û gelo ev helwest ne xweştir e?

Belê ji rojnameya Azadiya Welat heta Ajansa Welat nêzî 33 salan derbas bûye. Bi têkoşîna azadiya gelê kurd re çapemeniya kurd jî pêşde çûye, bedelên giran dane û kemiliye. Bi rastî bûye reng û dengê gelê kurd. Dengê jibîrketiyan derxistiye bê çav û guhan; ev bi her awayî ji çal û şikeftên kûr ên di dîrokê de ji wan re bûne goristan derxistine, ala hebûn û azadiyê bi nûçe, pênûs û kamerayên xwe ragihandine, xwedîîradebûn, xwedîgotinbûna wan ji bo rojane û dîrokê qeyd kirine.

Em di şexsê Apê Mûsa, Huseyîn Denîz, Gurbetelî Ersoz û Nagîhan Akarselê de cangoriyên çapemeniya azad bi bîr tînin. Hemû jî bi gule û satorên dewletê û hevkarên wan yek bi yek nemir bûn, ev roj afirandin.

Salvegera Ajansa Welat a duduyan ji niha ve pîroz be, bi hêviya domdina dengûrengbûna gel, bila berfireh bibe, geş bibe û êdî nûçeyên aştî, azadî û serfiraziyê zêdetir ragihîne.



xwebûn

8 - 14 Kanûn 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 312

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Çavkaniya jiyanê ziwa dibe

Fariz Firaz

Ava ku ji bo mirov, sewal û nebatan çavkaniya sereke ya jiyanê ye, li cîhanê her ku diçe kêm dibe. Çavkaniyên avê sal bi sal zuha dibin.

Av çavkaniya bingehîn a jiyanê ye. Di xwezayê de ji bo jiyana mirov, ajal, nebat û zindiyan xezîneya herî biqîmet e. Ji sedî 71ê cîhanê av e. Dîsa ji sedî 60 laşê mirov av e. Molekula ku form û teşe dide jiyanê ye. Av ji 2 hîdrojen (H) û Oksîjenekê (O) pêk tê. Di forma kîmyewî de wekî H2O tê binavkirin. Tahm, bêhn û rengê wê tune ye.

Li cîhanê her ku diçe ava paqij û bitendurist kêm dibe. Dîsa her ku diçe ava vexwarinê û ava şêrîn kêm dibe. Rapor û lêkolîn destnîşan dikin ku di 300 salên dawî de ji sedî 85ê qadên avî (avzêm) zuha bûne.

Li gorî rapora hevpar a Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) û UNICEFê ku di meha tebaxê de bi raya giştî re parve kirin; li welatên xizan mirov nikare xwe bigihîne ava paqij. Li gorî raporê li tevahiya cîhanê 2 milyar û 100 milyon mirov nikarin xwe bigihînin çavkaniyên ava paqij û bitendurist. Dîsa li gorî raporê nêzî 3 milyar û 400 milyon mirov nikarin li dordoreke paqij bijîn. Li tevahiya cîhanê her ji 4 mirovan yek nikare xwe bigihîne ava paqij û bitendurist.


Li Cîhanê û Tirkiyeyê her ku diçe ava vexwarinê kêm dibe. Eger li welatekî an jî li bajarekî ji bo pêdiviya mirovekî ya salekê dakeve bin hezar û 700 metrekupî, wê demê li wî bajar ango wî welatî stresa avê dest pê dike. Eger pêdiviya mirovekî ya salekê dakeve bin hezar metrekupî (1000m3) wê demê li wî bajar ango welatî xizaniya avê dest pê dike. Ew dibe welatê feqîrê avê.

**Tirkiye stresa avê dijî**

Li gorî rapora salane ya avhewayê ya Neteweyên Yekbûyî, Tirkiye yek ji wan welatan e ku stresa avê dijî û sala 2030an bi rîska ku bibe welatê feqîrê avê re rû bi rû ye. Li gorî Odeya Endezyarên Derdorê li Tirkiyeyê mîktara avê ya serê her şexsekî di zik hevde, nêzî hezar û 330 metrekup e. Li gorî lêkolînên Wekfa Parastina Jiyana Xwezayî li herêmên Ege, Akdeniz û herêma Anatoliyaya Başur û Rojhilat (bakurê Kurdistanê) mîktara avê di bin rêjeya ku tê xwestin de ye.

**Baran ji sedî 31 kêm bû**

Li gorî daneyên Midûriyeta Giştî ya Meteorolojiyê piraniya Tirkiyeyê bi zuhabûneke awarte re rû bi rû ye. Yek ji welatên herî zêde avhewa lê hat guhertin Tirkiye ye. Di meha çile û sibatê de barîna baranê li gorî sala par ji sedî 31 kêm bû. Nebarîna baranê û zêdebûna germahiyê bandor li ser rêjeya tijebûna bendavan jî kir.



**Çavkaniyên ava şêrîn zuha dibin**

Li gorî pisporan li cîhanê her ku diçe çavkaniyên ava şêrîn zuha dibin. Ji ber germahiya kurevî zêde dibe, hevsengiya avhewayê jî xera dibe. Li gorî salên borî sal bi sal barîna baranê kêm dibe. Ev jî dibe sedem ku çavkaniya ava şêrîn zuha bibe. Ajansa Avê ya Neteweyên Yekbûyî (UN Water), di raporê de destnîşan dike ku li tevahiya cîhanê nêzî 3.6 milyar mirov salê herî kêm mehekê qeyrana avê dijîn. Tê payîn ku heta sala 2050yî dê zêdetirî 5 milyar mirov ji ava vexwarinê mahrûm bimînin.

Li aliyekî ji ber qeyrana avhewayê, li aliyekî ji ber germahiya kurevî û li aliyê din ji ber zêdebûna gelheya mirovan ava şêrîn û vexwarinê her ku diçe kêm dibe. Bikaranîna çavkaniyên avê her sal ji sedî 1 zêde dibe. Ev jî dibe sedem ku çavkaniyên avê bêhtir kêm bibin.

Li gorî daneyên Enstîtuya Çavkaniyên Cîhanê ya DYAyê li ser ruyê cîhanê 25 welat tevahiya salê li dijî stresa avê têdikoşin. Eger li welatekî salê serê mirovekî pîvana avê dakeve hezar û 700 metrekî stresa avê dest pê dike. Dema li welatekî hikûmet nikaribe avê rast û baş bi kar bîne xerçkirina avê zêde dibe.

Li welatên ku herî zêde stresa avê lê heye, welatên Rojhilata Navîn û Efrîqaya Bakur in. Li bakurê Efrîqayê ji sedî 83yê nifûsê û li başûrê Asyayê jî ji sedî 74 rastî stresa avê tên. Herî dawî dewleta Îranê bi qeyrana avê re rû bi rû ma. Serokê Komara Îranê Mesûd Pezeşkiyan, di mijdarê de daxuyanî da û diyar kir ku eger di meha kanûnê de baran nebare, dê li Tahranê avê qut bikin. Eger av têr neke, dê bajarê Tahranê tahliye (vala) bikin.

Li gorî lêkolînên Enstîtuya Pasîfîk a rêxistina fikrê ya DYAyê di navbera salên 2020 û 2023an de ji ber meseleyên avê nêzî 400 nelihevkirin (xirabûna peymanan) çêbûne. Ji ber nelihevirinên li ser avê yên di navbera welatan û nav welatan de pevçûn û şer derketine.

**Li Tirkiyê jî ava şêrîn zuha dibe**

Li gorî lêkolînan, ji sedî 0.3yê ava li ser ruyê cîhanê tê bikaranîn. Li gorî nûnerên Rêxistina Çandinî û Zexîreyan a Neteweyên Yekbûyî (FAO) yên Tirkiyeyê çavkaniyên ava şêrîn bi lez zuha dibin. Li gorî pîvanên gerdûnî ji sedî 71ê tevahiya cîhanê av e. Lê tenê ji sedî 2,5ê wê ava şêrîn e. Ava tê bikaranîn jî, kêmî ji sedî 0,3an e. Li gorî rapora Rêxistina Meteorolojiyê ya Cîhanê (WMO) êdî hevsengiya gera avê xera bûye. Li aliyekî hişkesalî zêde dibe, li aliyekî çavkaniyên avê kêm dibin.

Li cîhanê çavkaniyên ava şêrîn û vexwarinê golên avê, çem û bîrên avê ne. Lê di salên dawî de çavkaniyên binerdê her ku diçe kêm dibin. Ji ber ava şêrîn bê kontrol tê xerçkirin her ku diçe li ser ruyê erdê çavkaniyên ava şêrîn kêm dibe.

**Cemed dihelin**

Girê cemedan dihelin. Girê cemedqeşa ya ku giraniya wê 450 gigaton e, heliya. Ji ber hilîna girê cemedê, li cîhanê, sala 2024an, behr 1,2 milimetre bilind bû. Ev jî dibe sedem ku çavkaniyên ava şêrîn heta demek dirêj kêm bibin. Kêmbûna ava şêrîn, bandoreke mezin li ser çandinî, cotkarî, sewalkarî û hevsengiya pergala ekosîstemê jî dike.

Sala 2024an, hawzeyên rûbaran (Çewlîg-mêrg) ji sedî 66ê an zuha derbas bûn an jî zêde bi baran derbas bûn.

Ji sedî 68ê çavkaniyên ava şêrîn xwe kişandine kûrahiya bin erdê. Ev jî dibe sedem ku av kêm bibe. Li gorî pisporan li welatên Somalî, Zimbabve, Erître, Mozambîk, Etiyopya û Efrîqeya Başûr di bin rîskeke mezin ne. Li cîhanê herî zêde Etiyopya qeyrana zuhabûnê dijî. Li welatên Îtalya, Îspanya, Yunanistan, Tirkiyeyê jî salê nêzî 6 mehan bi zuhayî derbas dibe. Li welatên wekî Iraq, Îran, Suriye û Urdunê jî ji ber qeyrana avê rîska koçberiyê jî heye.

Li gorî lêkolîna pisporan heta sala 2050an li ser ruyê cîhanê nêzî 216 milyon mirov dê ji ber zuhabûnê û tunebûna avê koçber bibin. Li welatên wekî Hindistan, Pakistan, Afganistan û Tacikistanê nezla (ast) ava bin erdê her ku diçe dadikeve jêr.

Pisporê çavkaniyên avê yê Ajansa Hawirdorê ya Ewropayê (AÇA) Dr. Nihat Zal, diyar dike ku çavkaniyên avê yên Ewropayê ji ber şertên avhewayê û zêdebûna nifûsê, her ku diçe kêm dibin. Nihat Zal bi bîr dixe ku ji sedî 30yê axa welatên Ewropa û ji sedî 34ê nifûsa Ewropayê di bin stresa avê de dijîn.

**Krîzeke mezin li benda me ye**

Li gorî raporan nifûsa cîhanê ji sedî 50î qeyrana avê dijî. Rektorê Fakulteya Makezanînên Xweza û Endezyariyê yê Zanîngeha Îstinye Prof. Dr. Bestamî Ozkaya, destnîşan dike ku li cîhanê her ku diçe qeyrana avê kûr dibe. Prof Dr. Bestamî Ozkaya diyar dike ku li tevahiya cîhanê 2.2 milyar mirov nikarin xwe bigihînin ava paqij û biewle û dibêje: "Eger em ava xwe neparêzin, qeyraneke mezin li pêşiya me ye. Neteweyên Yekbûyî 22ê adarê wekî Roja Avê ya Cîhanê îlan kiriye. Ji bo em avê biparêzin û rast bi kar bînin ev rojeke şiyariyê ye. Yek ji çavkaniyên herî girîng a jiyana mirov av e. Bi pêşketina qeyrana avhewayê, pêdiviya avê zêdetir dibe. Li cîhanê nêzî 3.5 milyar mirov ji ava biewle û xizmeta sanitasyonê bêpar in. Li cîhanê ji sedî 50yê mirovan bi zorê ava paqij peyda dikin. Di 50 salên dawî de ji ber guhertina avhewayê girê cemedan pir zêde heliyan."


**Ji sedî 85ê qadên avî zuha bûn**

Li gorî lêkolînên Prof. Dr. Ozkaya, di 300 salên dawî de ji sedî 85ê qadên avî (avzêm) zuha bûn. Di salên dawî de 485 hezar mirov ji ber ava qirêj nexweş ketin û mirin.

**Li Iraqê dibe pirsgirêkek esasî**



Li Iraqê ji ber ku dewleta tirk avê bernade, roj bi roj hişkesalî zêde dibe. Bi taybet ji ber av nayê berdan, çandinî, sewalvanî kêm dibe û gelek niştecihên gundan berê xwe didin bajaran. Berdevkê Wezareta Çavkaniyên Avê yê Iraqê Xalid Şemal der barê pirsgirêka avê ya li Iraqê ji Rojnewsê re axivî. Xalid got ku îsal baranek baş barî, lê bi temamî wê ev rêje pêdiviyên havîna bê pêşwazî neke.



**Forma Avê a Mezopotamyayê**

Di meha cotmehê de li Amedê di bin malovaniya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û bi hevkariya Tevgera Ekolojiyê a Mezopotamyayê, Forma Avê a Mezopotamyayê ya 2yemîn hat lidarxistin. Di formê de li ser ruyê cîhanê, bi taybet li hewza Dîcle-Firatê, ango Mezopotamyayê pirsgirêka avê hat nîqaşkirin û li ser çareseriyên pirsgirêkê hat axaftin.

Armanca forûmê ew e ku av li hewza Mezopotamyayê wekî maf û amûrek ji bo aştiyê were hesibandin û gelên herêmê di polîtîkayên avê de xwedî gotin bin. Lewma di nîqaşan de piranî li ser mafê avê û azadiya çeman hat sekinandin. Her wiha yek ji mijara sereke guherîna avhewayê û bandora wê li ser ava şêrîn bû. Careke din hat gotin ku ger tedbîrên berbiçav neyên wergirtin pirsgirêka avê her ku biçe wê zêde bibe.